# SÎSÊ

(ez dixwazim wek şehîd Berîtan'ê bibim gerîlla)

Çîya yê Bilind Warê me ye

Ar û namûs Warê me ye

Li hemberî Van zordestan

Li hemberî van xwîmmijan hevalekî ev stran  disitiri

Hevalê dî berê xwe da hevalê xwe ji pirsî:

-heval ji bo çi tenê çîya yê bilind warê me ye? Ma qey em hemû bajaran, deştan ,gelîyan,zozanan  bi zordest û xwînmijan re bihelin?...Ez jî Niha diçim bajêr,peywir a min li bajêr a,ûrema ,edî ar û namûs na barê min e?

-Gotinên te di cîh dane,heval. Çîya,deşt ,zozan,bajar  her dereka kurdistanê warê meye,her tim jî ar û namûs barê me ye,ji bo ku ew starana di bîra min de mayîbû min jî ew stirî.

Dû heval bûn. Rêka Wan  hewraz  û berwar bû. Tenê darên kevotê bişkivîbûn.ji bo ku zivistana derbasbûyî berf gelek barî bû,biharê jî baran gelek barîbû û şîverê jî têde hemû rê û rêç winda bûyîbûn.Ji ber vê yeke çolabir meşîyan.di rê de  hevalekî bidengekî nizm starana:

Serê çîyan bi dûmanê

Birîn kûrê bê dermanê

Bavê min distîrî

Piştî nîv  saet an jî çilûpênç xulekan li serê girekî ji bo bêhnvedane sekinîn.Gir bi şkêr bû.rûnîştin tlf ji ûydû yê vekirin.di heman demede zengê tlf  lida. Yê tlf dikir, hevalê ku li benda wan bû.di tlf ne de di got:-piştî dû saetan em ê w eli navberê dû qereqolan de li benda we bin,heya wê wextê li wê dêre hazir bibin.

Her dû heval ji serê gir,ji nava şkêran rabûn.bi bêhna fireh ber bi cîhê ku hevalek û dû dost libenda wan bi sekinin meşîyan.Berî ya yên ku li benda wan gîhiştin cîhê xwe. Heya ku yên ku wan pêşwazî bikin li paş kevirekî xwe  veşartin.tlf ne jî ûydûyê ji xwe vekirî bû.zengê tlf ne ku lêda,yên ku wan pêşwazî bikin bi tlf gotin: heval em li benda we amede ne.

-Em jî amede ne…

Her dû heval rabûn ser pîyan.di hewrazekî pir ase, hewrazekî ku pezkûvî jî nikarin têda bi hewakevin hevalek bi hewa ket.hevalê dîn jî li jêr,li ser rêya şoşe sekinî.Nûnerê PKK di serî rêzede her dû dost jî li kêleka destê heval guvaştin.berîya ku xal û xatirê hevdû bipirsin,ji dostan yê zikmeşk kenîya,berê xwe da hevalekê nûnertîya wan bû :

-ma,mirov bi vî rengî tê karên dîplomasîye?mirov bi kincên gerîlla tê bajaran,ji bo çi tu bi kincên sîvîl nehat?

-Ji bo ku, ez bi lezûbez bi rêketim,bajar jî dûra cîhê me bû,kincên sîvîl bi dest min neketin ji ber vê yekê ez bi kincên gerîlla bir ê ketim.

Piştî ve axatine berpirsê pkk yê bere,dost û berpirsê pkk ye nû bi hevdû dan nasandin:

-Ev heval me filankese,berpirsê meyê  nûye,ev herdû dost jî,hecî filankes û hecî bevankese,gotîna xwe qedand û kenîya…

-Heval ji bo çi tu bi ew qas dengekî bilind kenîya?

-Heval, edî li wî welatî pêwîst neke ku tu navê kesî bîne ziman,herkesek li wî welatî hecî ye,çû bê hece jî naçû bû hece jî ,herkesek hecî ye…

-Baş e,fanîlayê xwe bi ser yelekê xwe leşkerî de li xwe bike,em ê di rê de pêlavekê peyda bikin.pêlavê te yê mekap jî em ê biavejin.

-baş e…

Di navberê heval û dostekî piştî vê dîalogê , wesaîta mîgzemîm şofêr da şuxilandin û bi rê ketin.lê bala hevelê nû,nunerê pkk yê nû her li ser her dû dostan bû. Ji dostên ku ew peşwazîkirini yek xwîngerm bû.yê zik meşk, yê ku destpêke xêrhatina heval kirî,yêkî xwîngerm bû. Lê yê dîtir,yê qaşo dostê me; yêkî xwînsor bû.wek marekî yekî xwînsor bû .Qet, xêrhatina heval jî nekir.di dest wî de mekîneke wêne ye wêne yê xwezayê dikişandin.her ku dîmenên xwezayê balkêş,yên xweşik,yên ku hunermend nikarin wan şanese bikin dikişandin.

Rêka wan şoşe bû. Li di nizar re derbas dibû.ji ber aşûtê berf wek betone lêhatûbû. Mirov  ji ber vê yeke,wextê ku di pencerê wesaîtê de bi dervê dinêrî pir ditirsîya,zirava mirov diketîya.

Di rê de hema hema qet bi hevdû re neaxifîn.ji bo kirîna hin kuvarikan şofêr wesaît sekinand.her çar ji wesaîtê peya bûn . Şofêr xwest ku ji wesaîte peya bibe,ji dostên wan,yê zik meşk,yê ku kemeke xwîngerm û dev bi ken,li şofêr heytan,bi zimanê azerî:

-sen maşinde dur aşağı inme

-tamam inmem.

Sê kîlo kuvarik ji gundîyan  kirîn û li maşîne sîwar bûn.heya cîyê ku,xwarina xwe bixwun şofêr wesaît şewazekî asayî ajot.ji edî di rê de berf nema bû,rêk reşayî bû.li ber xwaringeheke,şofêr wesaît sekinand.her pênç ji wesaîtê peya bûn.berîya ku,têkevin xwaringehe hersêyan bi hevdûre gotin; em destnimêja xwe bigirin piştre taştê bi hevdûre em ê bixwun.Ji ber van gotinan berpirsîyarê  pkk berê bêjar bû.berê xwe da berpirsîyarê nû:

-ev ,ew qas  pir nimêj dikin ku mirov tu caran wextê xwe de nagîhije ser karê xwe.

Piştî nimejê deştê bihevdûre xwarin.taşte xwaringeke dewlemend bû;hekê kelandî

Rûnê nivişkî, zeytûnê kesk,ango zeytûnê salamûra,çay…

Dostê zikmeşk,piçeke xwîngerm,berê xwe da berpirsîyarê pkk yê nû:

-heval ez ê biçim ji bo te kincên sîwîl bînim, hûn hemû li vir li benda min bisekinin,heya ku ez bizivirim.

-Baş e hecî…

Dost bi lez û bez  çû , di heman demede zivîrî.yelekek,pontolonek û pêlaveka kundura bi heval re anî.Kincên ku,anine radestî berpirsîyarê pkk kir.bi wî re got:

-Heval biçe paş xwarinxanê li wê derê mezelek heye,kincên xwe ye gerîlla ji ber  xwe  bike,yên medenî li xwe bike.Ji bo rêzgirtina me jî tu wisa bike baştir a …

-Min li gel fîlîstînîyan perwerdehîya leşkerî dîtîbû. Wê wextê wan behsê girtina kadroyekî xwe dikirin.

-Çawa hatîye girtin,li ku derê hatîye girtin

-Wexta ku me li gel fîlîstînîyan perwerde didît. Ji bo ku kemasîyên ku kadroyê wan ketinê, em; jê dersan jê derxin serpêhatîyên xwe bi me re vedigotin.ji rêxistinê fîlîstînîyan yek; demeka dûr û dirêj ji bo peywireka derveyî fîlîstînê kadroyekî perwerde dikin.edî digîhijin biryarê ku ew kadro di kani wê peywire yê baş pêk bîne.ji bo peywire bi balafirê dişînin welatekî ewrupa ya.lê wexta ku balafir li pist tê xware ew mîlîtanê fîlîstînî diçe destşo ye,ji destşo fermûarê pontolonê xwe negire,tê li nîvaka balavirê fermûara xwe digirê ji ber vê yekê mîlîtanê fîlîstîne,polêsê wî welatê ewrupaye digirin.

-Rastê heval mirovên rijhilatanavîn hin tiştan li pêş çavan nagirin,lewma, em ji hin tiştên biçûk her winda dikin.

-Gotina te yê Hecî, nêzî sî salî yê danûstandina me  û we heye, eger dostanîya me ye bi salan nebûya,an jî hin hêzên dewletên dîn an jî hin hêzên rêxistinan li şûna we bûna yê ez  desgîr bikirima.

-Tu caran, em, wê yekê nakin.bi salanê me li dîjî endamên pkk pêkanînên wisa nekirine. Li dijî berpirsîyarê pkk fermî wê yeke qet nakim.

Ji xwarinxanê heya,heya ber derîyê mala pkk komunê di wesaîte de qet kes bi hevdûre neaxifîn.wexta ku ji wesaîtê peya bûn.sofêr jî tê de her caran bi kefxweşî destê hevdû guvaştin.

Lê,qaşo ew qaşo dostê pkk yê serrût,xwînsar di hemû rêwîtîye de wek bûmekî bû liv û tevgerên wî.

Dost û şofêr derbasî hûndirê malê komunê nebûn.Ji dostan yê zikmeşk û xwîngerm,piştî xatirê xwe xwest:

-em ê piştî dû rojan hevdû bibînin,hecîyê mezin ji were hevdîtina heval…

-Serçavan ,em ê piştî dû rojan hevdû bibînin…

Di mala komûne yê pkk de hevalekî tenê hebû. Rabû ser pîyan, hevalê nû ye ku berpirsîyare pkk bi hemû hêza xwe hembêz kir.berpirsîyarê Berê re jî bi serê xwe bi hevalê ku di malde got;

-Bi te re jî silav.

Piştre hevalê li malê ,hevalê berpirsîyarê nû re got:

-Siberoj  û dûsiberoj çand malên dostên me hene ez wan bi te bidime nasîn çi dibe çi nabe,dibe ku ewne bibêjin hûn her dû ji biçin,ji bo ku tu li wira tengav neba pewîste tu wan dostan nas bike,çêtir e…

-Wexta ku,li qadê medya yê parastinê hevalan ez peywirdar kirim,gotin min dibe ku,li ser sînor hevalê barê yê berpirsîyar rêkin,ji ber wê yekê bi min re gotibûn;agahî yê pêwîst ji heval bigira; ji bo ku, tu zahmet nakêşe,perîşan nabe.

Heval berîya ku,şîve bixwun çû destşoyê xwe şuşt.

Piştî şîve jî qet bi hevdûrê neaxifîn,demekakin telewîzyon temeşe kirin . ji bo zor westîyayî bûn ,herdû heval li ser qursîyan xilmaş dibûn.Ji ber wê yekê, hevalê li malê ewne herdû hişyar kirin,gota wan:

-Ji bo we min nivîn danîne ,rabin din av nivînan de binivin.her dû heval rabûn ser pîyan bi gotina hevalê xwe kirin.bi çavên xilmaş çûn mezelê ku têde binivin.Hevalê dîtir heya derengîya şevê,televîzyon temaşe kir .ew jî di mezelê ku telewîzyon tê de bû serpas , ango ser vekîrî nivist.

Berpirsîyarê pkk yê nû ji berpirsîyarê pkk yê bere bi çawan xilmaş pirsî:

-heval ew e ku sînor li gel te hatibû yekî serrût hebû,yekî gelekî xwînsar bû,wek marekî yekî xwînsar bû,ew zilam ma dijminê meye?

-Belê heval ew ji dijminê me jî xiraptir dijminê kî me ye.

-ji bo çi dijminayîya me dike,ew hevalê wî qet ne wisa bû dev bi ken bû.

-Ew ê ku tu behs dike ew ê ku wek bûmekî heya vir rûniştîbû li kêleka te,ew zilama li dîjî tevgera meye azadîyê tiştên xirap dike,zilamêkî wî jî xwestibû destdirejîye bike  jina doste dostekî me,hevalên me jî ew zilamê wî bi bi mirînîye ciza kirin,Ji ber wê çandê ew zilam wextê ku, endamakî pkk dostekî pkk di bîne wisa lê te,hema dixwazê heyfa xwe werbigire.

Piştî teştê,berpirsê pkk yê nû hevalê ku li mala komunê bi hevdûrê derketin devre, ji bo dîtina dostan û naskirina bajêr. Dû rojan û heya derengîya dû şevên herdû heval li malên dostan û bajêr gerîyan.

Ji dû rojan şunde,siberoj zû zengê têlefona berîkê lêda,hevalê pkk yê berê rahişt  têlefonê:

-Silav û hurmet,Hecî çawa yî baş e?

-Silav û hurmet heval,ez ê behneka dîn bêm hevalê ku nu hatî bibim,ji bo ku bi Hecî yê mezin re dan û standinê bike.hûn herdû heval jî xwe hazîr bikin,hûne ji welatê me, edî biçin.

-Hecî, heval yê çawa bi serê xwe tenê bimîn e,tu deran, tu kesî jî nasnake, pewîste, em yek li cem heval bimînin,pewîst bû ez biçim, lê hevalê dîtir li gel heval bimîne.em pkk ev helwesta we qebûl nakin,tu caran!...

-Me, li civîna dawî yê ku,  me bi hevalê ve re  pêkanîbû, ev qerar wergirtibû heval.,Lewma hûn herdû heval ê biçin,berpirsê we yê nû yê li wir tenê bimîne.

Bi şewazekî bêdil û tund heval got:

-Baş e hecî.

Siberoj zû hecîyê zikmeşk,bi têlefone got;piştî saête ez li gel we me,her dû hevalê ku berê li vir, yê biçin,bi hevalê nû yê berpirsîyar re jî Hecîyê meye mezin ye wêre hevdîtine bike.

Her dû hevalê ku, biçin di berê de hazirtî yê xwe kiribûn.Ji bo ku bi xwurînî bi rênekevin,bi lez û xwurînîya xwe şkenandin,teşte xwarin.Di wexta ku Hecîyê zikmeşk gotubû;  hazir bibin zengê derî mala  lêda.berpirsê pkk yê berê derî vekir:

-Kerem bike,Hecî.

-Spas,hûne biçin,li ser rêka qîr wesaît amedeye.

Herdû hevalan,bi mirûzekî tirş,gotin:

-Baş ê Hecî.hevalê wan ê yê li wê derê tenê bîmîne jî bi hemû hêza xwe hembêz kirin:

-serketin heval,xwe baş binêre.

-Ji bo we jî serketin heval no,hûn jî xwe baş mezekin.

Hecî yê zikmeşk,berpirsê pkk heya cîhê ku hevdîtîn pêk were bi teksîyê bir.Xanî yê ku çûyîne de kes tunebû,telewîzyoneke ne ji ûydûye,yeka herêmî,makîneka faksê û sobeyeka gaza xwazayî têde hebû.heval ji xwe mezele dîtir jî nedîdibûn.

Hecî yê ku, biheval re hevdîtin pêkbanîya pir dereng ma.ji ber vê yekê, heval pir bêzar bû. Serê her kêlî yekê,ji Hecîyê zikmeşk pirsdikir:

-Hecî Hecî yê kengî were?

-Karê wî derketî ye, ji ber vê yekê dereng maye,bibaxşîne.

-Karên min jî hene Hecî,hem jî gelek karû barên min ê pewîst hene.

-Ez çi bikim heval tiştek ji dest min naye, ew ne ku çi dibêjin, ez gora wan tevdigerim.ew e j i min peya bilindtir a,ez navêrîm ku, ez caraka dî jê pirs bikim,bejim hecî tu çima dereng ma.

-Heval ji neçarî got:

- baş e hecî

Berî ya nîvro Hecî yê mezin û li gel wî jî yekî dîn;  ji bo hevdîtine hatin.bi silavê ketin mezel,destê xwe derejî heval kirin, ye yê ku li pêşîye kete mezel;yê dirêj ,yê ku,serê wî heya nîvî rût gota heval:

- Tu bi xêr hatî,tu çawa yî, ji bo ku ez dereng man li min biborîna.

-Xem neke hecî,spas tu çawa ye?

-Teşekure dikim,heval.

-hevalên ku, ez nadikim  çawan e?

-Hemû yan silavên xwe ji bo we şandin.

-Ser seran ser çawan.

Piştî vê axaftinê demeka kin bêdengîyek kete mezel kes kes bi kesî re neaxifîn.Piştre Hecî ye mezin yê fars,berê xwe da ,hecî yê azerî yê ku li gel hevdû hatibûn,bi farsî gotê:

-tu,wî nasdike?

-Na,ez nasnakim.ez navê wî qet gu lê ne bûyîme,nêzî sî salîyê ez bi pkk re dan û stadinê dikim,lê ez wî nasnakim.

Paşe ji berê xwe heval,Hecî yê fars:

-Ma,hevalên te çima wisa dikin?...Ma qey sî salê danûstandina me heye.Em bi hevdûre çê, xirap bi dostanî dimeşin,di tekîlîyên me ye ew qas salan de ,hîna ku di navberê me de gelek pirsgirekên ku bêne çareserkirini hebin jî, em jî, hûn jî pêwîste li hemberî hevdû bi rêz tevbigerin.

-Ez tam tênegîhiştim Hecî? Tu caran pkk,endamên pkk li hemberî dostên xwe bê rêzîyê nakin.

-Heval; her tim berîya ku heval an jî hevalên we werin gel me,berê sîcîlê wan bi me re dişînin,vê carê tenê navê te şandine,ji bo çi?

-Hecî; ez, bi lezûbez hatim.Nameye ku ji bo we jî hevalan şandî,hevalan bi lezûbez nivisandin.dibe ku ji ber wê yekê hevalan sîcîla min bîr kiribin.Lê, hûn hin tiştan qet li pêş çawan nagirin,hin tiştan paşçav paş û gu dikin.

Ji ber vê axaftina heval hecî yê fars bêjar bû,bi hers:

-me çi paş çav û paş gu kiriye,heval?

-Mînak Hecî,ez, hatim gel we berpirsîyartîya pkk yê nû.Pewîstbû berpirsîyarê me ye berê biçûya;lê hevalê li gel wî li wir li gel min bimaya,lê, we ew heval jî şand,li wir ez tenê çawa bikim?Ez, tu deran û tû kesî jî nasnakim,ma qey ev helwesta we rast û duriste, di wê helwesta we de rêzgirtin heye?Ez di wê helwestê sîstemê komarê islamî de rezgirtine nabînim.

Ji ber bersivên heval hecîye fars bezar bû.ji bo hêna ji xiçil nabe ji ber axaftine heval,bi dengekî bilind û bi hêrs:

- Te qet leşker,polêsên me kuştine an jî na? Qet bere tu hatîyê îran ê an jî,na?

-Ez tu caran nehatime îran ê.lewma ne pêkane ku ez leşker, poles an jî hin peywirdaran we ye dîn jî bikujim.careka tenê,ez mecbûr mame derbasî axê we bûme.

-kengî, ji bo çi tu derbasî axa me bû,heval?tu di dere re,di kîjan sînorê me û Tirkîye derbasî axa îran ê bû?

Heval bi serê xwe Hecî ye zikmeşk ,yê ku heval ji sînor heya bajarê Ûrmîyê anî nîşanî Hecî ye fars da:

-Wexta ku, Hecî ez ji sînor wergirtim heya vir em dihatin,me li xwarixanekê taştê xwar;li hindava wê xwarinxanê çîyakî asê heye,em sê heval bûn; em sê heval di wî çîya yê ase serberjêr daketin,piştre em di deşteke de çaryek daqîqan meşîyan,piştî deştê di hewrazekî ase de bi hewa ketin. hevalekî me jî birîndar bû,me tû rê û rêbar nasnedikir,ji ber vê yekê ji neçarî em her sê heval derbasî axa Îran ê bûn.

-Hevalê we ji bo çi û kê birîndar bûyîbû?

-Piştî ku serokê me Evdillah Ocalan ,bi komployekî navnetewî ji alî hêzên dagirker ve dîl hate girtin;em nêzî çil hevalî ji Bakûrê kurdistanê, ji herêma Metîna dihatin ku derbasî,herêma behdînan bibin,li ser sînorê we, em, ketin kemîna leşkerên tirk.

-Saet çand bû.we şehît dan an jî na?

-Berbanga sibê bû.tava heyvê jî hebû.

-Şiklê kemînê çawa bû?

-Bi awayekî nîv hilal kemîn danî bûn.Piştî ku; em, derbasî axa wê bûn,piştre li me dan.

-We qet şehît, an jî birîndar dan an jî na?

-Belê Hecî, me şehîdek da.Ew jî yekî hevalekî meyî Asûrî bû.Ew sax girtibûn.Bi êşkence ew şehît kiribûn. Êşkenceyeke hovane lê kiribûn.dil û çawan wî derxistibûn.

-Çand birîndarê we hebûn.

-Birîndarekî me hebû.ew jî ji pîyê xwe birîndar bûyîbû.Em, li gel hevdû derbasî axa Îran ê bûn.Heya êvarê xwîna birîna wî nesekinî,evarî sekînî paşê jî bi rêka gundîyan me tekîlî bi hevalê xwe re danî, em, çûn cem hevalê xwe.

-Başê, em ê edî ji te xatirê xwe bixwazin,siberoj heval Hecî yê bajêr bi te bide nasandin.

-Baş ê Hecî, ez, bajêr nasbikim çêtir e.

Hecî yê zikmeşk,heval heya mala komunê bir.wexta ku xatirê xwe ji heval xwest,gota heval:

-Siberoj hazir be,ez bajêr bi te bidim nasandin.

Siberoj Hecîyê zikmeşk û dev bi ken li saet heyşt,bi têlefone bi heval re got:hazir be, ez ê te li bajêr îro bigerînim,bajêr bi te bidim nasandin,ji bo ku tu zor û zahmetîyan nekişîne.

-Baş e hecî.

Piştî deh an jî çaryek deqîqan zengê derî xanî lêda,heval derî vekir:

-Silav heval…

-Silav Hecî…

-Kerem bike Hecî ;em, runîn taştê bi hevdûre bixwûn.

-Na heval,em biçin li xwarinxane taştê bixwun li wî bajarî sibe serûpê û avgoştê xweş çêdikin.

-Baş e hecî.

Heval û Hecî yê zikmeşk; nêzî bîst xulekan bi texsîyê nava bajar de gerîyan.bajar hîna ne qelebalix bû.hîna xelkê bajar ji malan xwe derneketibûn.ji ber vê yekê jî, zû gehîştin xwarinxane ye ku taştê lê bixwun.Hecîyê zikmeşk berîya garson ji heval pirsî:

-Heval te avgoştê an jî serûpê bixwe?

-Serûpê.

Hecî yê zikmeşk paşe deng li garson kir:

-Ji bo me serûpê û avgoştê bîna.

-Serseran hecî

Bersiva garson û taştê anînê garson di heman demê de pêk hat.

Hecî û heval xwarina xwarin.Rabûn ser pîyan heval pere taştê dan.Hecî yê zikmeşk ,berîya ku heval pere bide garson, bêdil destê xwe avetê berîka xwe, lê heval bi lez berîya wî pere dan.

Her dû ji xwarinxane derketin,ji bo bajarê ku Zerdeştê kal jê ji dayîk bûyî,binasin,lê bigerin.

-Hecî yê zikmeşk gota heval:

-Em berê li nav bajêr bigerin,Nêzî saeteke,paşe jî em biçin golê,tu çi dibêji heval?

-Ez tu deran nenasim Hecî;tu min bibi ku derê ,tu dizanî.

Nezî saetekê li nav bajêr gerîyan.cîhê ku heval re her tim pêwîst nîşanî heval dan;rê,stasyon,kuçe…

Li hin cîhan jî, Hecî yê zikmeşk,heval hem agahdar û hişyar dikir.Li cîhê leşkeran,polêsan di gota heval:

-Evder yan cîhê leşkeran e yan jî cîhê polêsan a,pêwîste; tu li cîhê wisa yek car negere,vêne yê van deran qet nekêşe.

Hecî yê zikmeşk çi digot;heval jî, bi serê xwe erê dikir.

Di nava bajêr de, tiştên ku bala heval dikişan baxçeyên mêwe bûn;baxçeyên sêvan,xoxan, hirmîyan,mişmişan…lê belê, li hêla dîn jî,ji bo avakirina avahîyan birrîna baxçeyê daran bû.Li cîhê daran edî avahîyên ji betonê bilind bûyîbûn.Li hêleke bajar mezin dibû;Li hêla dîn jî, xweza wêran dibû.Vê yekê heval dixista nava fikrê û fikarên cida,cida…heval xwe bi xwe re ,di got:

-Ma qey pewîste ew qas ev baxçeye bê hempa bi wî awahî bêne telef kirin?Ma qey, ew qas pêwîst dike ev bajar mezin bibe,ew qas birrîna daran,xweza yê qebûl bike,rojeke xweza heyfa xwe; yê ku wê hildiweşînin, wê qetl dikin hesabê vê yekê pirsnake?...

Dema ku,heval li ser talankirina xweza yê diponîjî,Hecî yê zikmeşk gota heval;em ber bi behrê(gole) biçin baştir a.

-Gotina te ye, Hecî.

Her dû yan bi texsî ye berê xwe dan gola Ûrmîye.destpêke berê xwe dan başûr-rojavaye gole paşê ji berê xwe dan bakûr-rojhilatê golê. Ser danê êvarê ji bêrê xwe dan rojhilatê Ûrmîye,cîhe ku dera Asûrîyan ê kadîm lê.

Hê na li gundan baxçe mêwe pir bû.dardora bajêr hemû baxçeyan mêwe bûn.ji bo ku baran barîbû wê rojê kem gundî din ava baxçeyan dixebitîn.hê na gundîyan baxçe xwe bi avahîye betone re negûherîbûn.hîna gundîyan kevneşopîyên xwe parastibûn.baxçe,dexl,parçek ji jîyana wan bû.Lê, bajarî ne wisabûn.dîn îmana hin bajarîyan pere bûn.Ji bo ku, bi lezûbez hin bajarî berîkê xwe bi

werîminin,her tiştek difirotin.çavên wan bilî peren tiştek nedidît.Lewre baxçe talan kiribûn bajar bûyîbû çoleka ji betone….

Li başûr –rojavayê bajêr,Hecî yê zikmeşk ji heval pirsî:

-Em, li çayxanê ke,çaye ke vexwun an na?

-Em vexwun, Hecî; wexta nimêje ye,ez ê nimêj jî bikim.

-Baş e,hecî

Nêzî saeteke bi texsî ye gerîyan,lê rastî tu çayxanan nehatin.piştî saeteka rasta pîramêrekî hatin. Pîramêr zibilê axurê sewalê xwe diavet. Hecî yê zikmeşk ji pîramêr pirsî:

-Mamo li vanderan çayxane nîn e.

-Belê birazî,çayxana min jî heye,dikana min jî heye.

Kalêmêrê ku, axûrê sewalê xwe paqiş dikir;bi destên xwe yê bi rêxa sewalan dû çay û li rex çaye jî pasta li ser senîyekê ji mala xwe anî cîhê ku heval û Hecî yê zikmeşk lê rûniştîbûn,li ser masê danî.

Wexta ku;çawên heval bi destên wî yên bêmarêz ketin, dilê heval rabû.lê belê heval ji neçarî çay û pasta jî vexwarin û xwarin.Di wê kêlîyê de di navberê Hecî yê zikmeşk û xwedî yê çayxanê nîqaşeka sosret borî.Hecî yê kalamêr re got:

-Hecî hê na biharê ji bo çi ava golê aw qas kem e?

-Tu dizanî baran û berf pir kem barî, ji ber wê yekê ye.

-Hecî ji bo çi baran û berf kem dibare?zivistana borî berf yekcar nebarî,piçekê jî, baran barî bi barana ku barî jî gol tijî nabe.Tu, dev ji hişkbûna golê berde,ji bo ku sal wisa bê berf û baran diborin.gelek nexweşî peyda dibin.

-Sedema vê yekê çiye, hecî?

-Gorî min em xweza yê qetl dikin,xweza jî li me tê xişm e.xweza ji, ye kû vê talan dikin.heyfa xwe werdigire.Bajêr binêre hecî her derek bû beton.berê herderek baxçe yê mêwe bûn.

Heval û Hecî yê zikmeşk; ji çayxanê berê xwe dan rojhilata Ûrmîye,dêra Asûrîyan.Rêya dêre hin qîr bû hin jî şose bû.lê, hina baxçe û dexlê ku hem di rêka dêre de,hem jî li derdora dêre nehatibûn birîn.bi piranî baxçe,bax,dexl hîna li şuna xwe bûn.Ev dera yanê derdora dêra asûrîyan hîna nehatibû çol kirin.dêr jî ji xwe dinava bax,baxçe yan de bû.

Hecî zikmeşk,bi berpirsê dêre re got:

-ev xweşmirov mêvanê min ê dixwazê li dêre bigera,pir ji cîhê wisa yê kedîm hez dike.

Berpirsîyarê dêre gota hecî:

-Serseran serçavan û gazî yekî ku li dêre dixebiti kir,bi zimanê asûrî hin tişt vê re gotin.zilamê xebatkar bi serê xwe gotinê berpirsê dêre êre kirin.Piştre, bi heval û hecî yê zikmeşk re got:

-Bi fermo.

Bere derbasî cîhê ku fotoxrafê hz Îsa têda bûn.li dêrî xebatkar pêlavê xwe ji lingê xwe kirin,piştre heval û Hecî jî pelavê xwe jî lingê xwe kirin derbasî mezel bûn. Di mezel de, tiştê ku bala mirov dikişand zindîbûna wêne yê hz Îsa bû.tiştê dîtir jî paqişîya mezel bû.

Xizmatkarê dêre ku liv û tevgara wî çawa bû; heval û Hecîyê zikmeşk jî wisa dikir.xiamatkar bere li ber wêne yê hz Îsa sekînî îşareta hacê Îsayîyan kir. Heval û hecî yê zikmeşk jî ew îşaret ku xizmatkarê dêre kirî diheman demede kirin.Paşê xizmatkarê dêrê li cîhê dîtir ewana gerandin.hin agahî dan wan.gota wan ev der heftsed salê hatîyê avakirin.

Her dû ji, dêra derketin bêre xwe dan mala ku; heval, edî bi tena serê xwe lê bimîne.

Di rê de  heval li ser cîhê ku,Hecî yê zikmeşk pê dane nasandin pir hizirî.Her dida hizra xwe heval; gelo ma bô çî, Hecî yê zikmeşk nebirim dêreka Ermenîyan,mizgefteka kurdan,sînagogaka cihû yan?..Di dilê xwe de heval got; ez jê pirs bikim çêtir an jî ne çêtir e?Lê,  di dilê xwe de heval biryar da  ku, ji hecî yê zikmeşk pirs bike û jê pirsî:

-Hecî ji bo çi, te ez nebirim dêr an jî cîhekî dîtirî Ermenîyan,Mizgefteka kurdan,sînagogaka cihû yan?

-Heval Ermenî hîz û diz in.navberê me Azerîyan û ermenîyan nexweş e.wexta şere Simko yê Şîkakî Kurdan û Ermenîyan pêkva em Azerî qetl kirin.li vir kurd sunî ne, em jî şîa ne.Lewra min tu nebir cîhê Kurd û Ermenî yan. Vê gave jî navberê Ermenî û Azerîyan nexweş e,ji ber pirsgirêka karabax ê.lê, navberê komarê Îslamî yê Îran ê û Ermenîstan e xweş e.Em, Azerî ji ermenîyan heznakin.cîh  û warê kurdan jî ez bi xwe kem diçimê, ji bo ku ez karmendê îstîhbaretê me,ez jî xwe ditirsim.

-Ji bo ç;i tu ji xwe ditirsî Hecî ma qey te gelek neheqî zilm li kurdan kirîyê?

-Na heval,min tu neheqî li kurdan nekirî ye.Lê belê, tu dizanî li dawî PJAK we da damezrandin.mîlîtanên PJAK ê û mîlîsên wan êrîşe me dikin.

Heval di dilê xwe  de got:

-Sa bav, ez bawerdikim te çigas li kurdan zilm kirîye?ez dizanim çigas tu yekî zilmkar û bêrehnme.

-Cîhê cihu yan jî, ji me kes naçi ye.Cihu piranî jî, ji welatê me çûn.sînagogê wan hemû jî girtîne.

Li ber derîye mala partîyê Hecîyê zikmeşk, xatirê xwe ji heval xwest.Heval kir nekir hecî derbasî jor nebû.Heval derbasî jor bû.lê belê, her gotinê Hecî yê zikmeşk difikirîn. Ew gotinê wî yê di der heqê gelê Ermenî û  Kurd kiribûn heval xistibû nava fikarên xirap! Bi giranî gotinê ku ;di der heqê gelê ermenî de kiribûn pir giran  li heval hatibûn.Gora heval gelê eEmenî ji gelê cîhanê yê herî zekî,herî bi ahlaq,herî pagij bû.

***************

Tenê yî çi ye?taybetmendî yên xwe çawa ne?li ser mirov bandoraka çawa pêk tîne? Ji bo kîjan hest û hiziran rê vedike?wexta ku mirov din nava gel,heval,hogir û hezkîrîyên xwe be hest û ramanên çawa mirov peyda dike?wextê ku mirov di nava dijminê xwe bi serê xwe tenê bimîne hest û ramanên çawa di dil û mejî yê mirov de peyda bibin.Jixwe, yekî heval li gel di diman,dost bûn an jî dijmin bûn ne eşkere bû.Ji alî  dîrok ,erdnîgarî û qewmîyatîyê mirovê hevdû bûn.lê belê; tu caran,wan qewmê heval

qewmê kurdan pêşneexistibûn,tu caran li hemberî heqê qewmê kurdanê sîyasî rêznegirtibûn,heta nirx û berhemên kurdan yên sîyasî,civakî,aborî,dîrokî destêser kiribûn.

Heta hin dîrokzanan û yê ku bi navê bavê dîroke tênasîn Heradot wisa nivisandibûn:wexta Dara yê mezin(darîûs) bûye û împaratorê persan,hemû destketîyên kurdan ji dest girtine.heta xwedê yê kurdan ji xwedê yê xwe pejirandîye.yanê xwede yê bav û kalên kurdan,xwede yê medan xwedeyê pêxamber zerdeşt; Ahura Mazda xwede xwe qebûlkirîye.lê belê,panzdeh salan jî tu berhemên Zerdeşt'ê kal berhev nekirine. Berhemên giranbiha yê Zerdeşt; Gata yê Zerdeşt…Heta; tê gotin ku; panzdeh salan Dara, navê Zerdeşt qet neanîye ziman.piştî panzdeh salan navê pexember Zerdeşt û berhemên wî ye giranbiha berhevkirinê û weşandine.

Wexta ku,sedema ve yeka dara(darîus) anjî ji peywirdarê wî hatî ye pirsîn;bersiva wan, xeta an jî suçê wan ji wê kiryara wan hîna kembaxtir bûye…gotine:-wexta destpêka damezrandina Împaratorî ya meye persan bû, şer û pevçûn di hundir de û bi dijminê derve zor bû, ji ber wê yekê,me nikarî berhemên zerdeşt berhev bikin an jî biparêzin… Zerdeştê kal,pexamberê xwede ye Ahura Mazda,xwede ye qencî ye,tu caran,navê wî heya panzdeh salan bi lev nekiribûn? Mirov din ava dewleteka wisa bi tenê be, ji pewîstîyên biçûk,heya pêwîstîyaka mezin yê çawa pêkbîne.yê ji kê alîkarîy werbigira,eger ji alî fikir,raman û xebate de ,hezê xwe têra hin tiştan neke,ji kê yê alîkarîye werbigira?...

Tê gotin ku;taybetmendîyên tenê tî yê xwedê yî ne.ji bo çi taybetmendî yên tenêyî yê xwede yî ne… ji bo çi taybetmendîyên tenê yî yê ne şeytanîn a? Heval, ev yeka jî fehm nedikir.Heval, di vê mijare de her bi xwe re din ava nîqaşên giran dibû.di gota xwe; ma qey wexta ku,mirov tenê ma, mirov her tiştên baş difikire, dike ?ma qey mirov wexta ku,tenê be tiştên ne qenc qet nayên bîra mirov,fikr ,raman di mêjîyê mirov de peyda nabin,ev fikr û ramanên wisa rê li ber hin kiryarên nebaş,kiryarên ku mirov ji rê dertêxin venekin? Taybetmendîyên tenê tî ye xwedêyîbûn bûn, an jî şeytanîbûn? Heval hîna ev yeka nedizanî.Dixwest ku,bersiva vê yekê peyda bike,ji bo ku bersiva vê yekê peyda bike jî pêwîstbû ku, bi serê xwe tenê bi jiya…

****************

Heval hefteyekî tenê ma,din ava hizir û ramanên baş û yê nebaş de...yek caran; tenê ji bo pêdivîyên xwe ye roje dediket derve ,di heman deme de dizivirî mala xwe.rojeke zengê têlefonê lêda,heval rahişt têlafonê:

-Alo, rojbaş,silav û hurmet,heval…

-Silav û hurmet,rojbaş Hecî.

-Tu çawa yê, heval?

-Sax be,Hecî.

-tu jî, sax be Hecî.

-Ez kêlîyeka dîn li gel te me heval.

-Ser seran ser çawan,Hecî

Dengê Hecî yê Zikmeşk, bi heyacan bitirs bû.Ji ber vê yekê; heval keta nav heyacan û fikaran…Hatina Hecî yê zikmeşk dereng nekêşa,piştî têlefon kirina wî ji bo heval,deh an jî çaryek xulekan zengê derî hewşê lê da.Heval derî yê hewşê vekir,destê hevdû guvaştin.Hecî' yê zikmeşk; ew qas bi heyacan û tirsîyayî xuyanî dikir ki,qet rewşa heval ji nepirsî,hema dest biaxaftinê kir,axaftineka bitirs û heyacan:

-Heval;sê hevalên we,bi hezên me ye ewlekarî ye re ketine şer, hevalekî we jiyana xwe ji dest daye.li gel hevalê we yî ku jîyana xwe ji dest dayî,têlafona hevalê we  ye ku berîya te li vira peywirdarbû derketî yê.Lewre,pêwîste em derîyê vê malê qivil bikin ji vê malê biçin malaka dîn. Hecî ev axaftina bi heval re kir û çand çaran jî xwe bi xwe re  bi dengekî bêzar,heyacan û tirs axifî:

-Me,çand  caran bi wî hevalî re gotibû me neke nava  zor û zahmetîyên bi wî rengî!Niha, em ê çi bersivê bidin berpirsê xwe,berpirsê nûnerê dewletê xwe,a xirap jî,heval em ê  te çawa bi parêzin?

Hecî, hem bi wî rengî di axifî,hem jî di mal de çavên xwe li tiştên qedexe,tiştên ku bo wan pirsgirêkan peyda bikin digerandin.pelava mekabe ku li malê,çand pirtûkên ku ji gora kanûnê wan qedexe,Hecî xistin tûrikekî naylonê rahişta wan,paşe bi heval re:

-Hemû derîyan qifil bike,lambeyeka elektîrîkê jî vekirî bihila,em bi lez ji vira biçin,heval…

-Baş e ,hecî.

Bi aweyekî lezgîn ji malê derketin,çûn taxeke ku li hewrazekî de,di li wê taxê çûn xanîyekî raxistî û vala.di mezelê xanî de; soba gazê xwezayî,telewîzyoneka herêmî,makîneka faksê û hin nivîn hebûn.

Heval, bi wî rengî ji anîne gelek bêjar bû. Lê belê, ev yeka eşkere nekir. Ji vê helwestê gelek bişik û guman bû.Tiştên ku Hecî yê zikmeşk digotin rast û durist in an jî di xwestin wî bixapînin,biceribînin,ka,heval kesayeteka çawa yê ji tenê mayîne di tirse an jî natirse,bi kêre tekîlîye xwe hene,bi tekîldarê xwe re bi kîjan awayan û kîjan rêkan tekîlîye datîne?...

Dû rojan, hecî yê zikmeşk û heval di wî xanî de li gel yek man.Hecî hema xwe li mezelê rûnîştine  dirêj dikir û dinivist.Heval jî li mezelê mêvanan radiza.

Di navberê her dûyan de kem axftin pêkdihatin.Lê belê, Hecî her bi jina xwe re bi têlefone diaxifî.Qet ledana dengê zengê telafona wî kut nedibû.her bi jina xwe re,digot;hezkirîya min, çand rojan karê min he ye,eger ku karê min xilas bû ez li gel te me,ez te hembêz dikim, çavên her dû kurê xwe jî maç dikim.jina wî yekcaran têlafon di da dest zarokan,zarok bi bavê xwe re diaxifîn.piştî ku axaftin xilas dibû;hecî bi dengekî bilind digota xwe; ez ê pêdivîyan van kîjanan bikirim, an jî kîjanan nekirim,di vê mijare de edî ez jî şaş bûm.

Heval ji helwesta hecî yê zikmeşk matmayî ma û jê pirs kir:

-Ma qey Hecî zorakên te, ji te pir tiştan dixwazin?tu dibêja; ez bi wan re çi bikirim,çi nekirim?

-Belê heval ,yek hîna didergûşê de ye.lê, yek jî dûwazdeh salî ye.yê diderguşê de hîna ew qas mesref li wî nabe.lê, ew ê mezin ez pêrîşan kirim.Kengî ku; ez bi dayîka wî re têlefon dikim,hema ji dest dayîk xwe têlefone digira,berîya ku halê min bipirsê,dibêja bava wî tiştî bi min re bikira,wî tiştî bi min re bikira,edî ez ji pêdivîyên wî bêjar bûm.çawên wî, çi dibînin wî dixwaze,yekî çavbirçî ye .Ez karmendekî dewletê me maaşa min tenê têra tiştên ku ew dixwaze nake.

-Wê wextê,zorak mezin kirin zor û zahmet ê;Hecî.

-Raste heval,xanî min bi kîra ye.Hîna min xanî ava nekiriye.Ez bi kotegî debara xwe dikim.Ew kurê min jî ku çi li bazarê dibîne wî dixwaze j imin.

-Hîna serwext nabûye, Hecî.

-gotina te ye heval,hîna halî nabe,pêwîste ez dayika wî,wî têbigîhînim.lê belê; ez bawernakim ku, em bi serkevin,ez nizanim nifşê niha hemû wisa ne,an jî xwedê ev bela daye me.

-Ez nizanim, Hecî.Ji berk u, ez hatim dinê, ez li çol û çîyan im. Ez tu caran jî nezewîcîm.

-xwedê emre zarokên te dirêj bike,Hecî.

-xwedê ji te razî be.

-ji te jî…

-Hecî, tu dikani biçe mala xwe.Ez ê li wir tenê jî bimînim.

-Ma tu tenê netirse?

-Na,hecî ez yekcar netirs im.

-Ez ê, wê wextê, ser danê êvarê biçim cem zarokên xwe.

-Baş e,hecî.

Hecî ser danê êvarê xatirê xwe ji heval xwest û çû.Lê belê, berî ya biçe dîsa biheval re got:

-Heval,têlefonê bi kar bîna.

Li ser ve gotina Hecî yê zikmeşk,heval gelek ecz bû,bi hêrs bi Hecî re got:

-Ma min; çand caran bi te re got,têlefone ku hevalê berîya min bi karbianîne, ew her dû têlefon min danê xwedî yê wan.Hecîyê zikmeşk li ser eczbûna haval xwe ker kir.

Hecî yê zikmeşk, ji cem heval çû.Heval ma bi serê xwe tenê û li ser helwesta hecî ponijî.Her da hizra xwe,her helwesta Heci di mejî yê heval de cîhe kî sereke digirt.Gelek pirs di mejî yê heval de,gelek hestên baş û nebaş jî di dilê heval de hebûn.Heval di mejî yê xwe de her nîqaşên wek;ez ê li xeta serokatî yê,şehîdan tevbigerim,bi eyna xwe yê paqiş ez ê peywira xwe de bi şiklekî serketî ezê pêkbînim derkevin peşberî serok,şêhîdan,gel,hevalên ku li di nava xebate de;bi taybêt hevalên gerîla,hevalên ku li kurdistanê dixebitin.

An jî awayekî rûreş,awayî xwe belavkirî,avayekî kesayeta xwe neparastî,di nava gamara welatê ku li peywirdar,qamara wî welatî di kesayet û peywira xwe biqedanda …

Pirsên bi wî rengî di mejîyê heval de,hestên bi wî rengî jî di dilê heval de di cûn û dihatin.

Heval, bi wî rengî xwe li ser nivînan direj kir.Lê belê, her li ser anîna xwe yê wê derê difikirî;Hecî, ji bo çi ew anîbû wê derê,heval bi rastî hatibûn şehîtkirin,bi rastî di berîka hevalêkî de,têlafona hevalê ku,berîya wî peywirdar hatibû girtin,an jî, ew xapandinek bû,dekûdolapek bû…dibe ku dekû dolap be,dibe ku rast be,heval wî rengî din nava nivînan de dirêjkirîbû,lê, heya ku tava rojê dipencerede li mezelê ku ew têde nivistibû xist ew din ava nivînan de gevizî,ha gevizî…

Wexta taştê xwarine Hecî yê zikmeşk, li zengê derî malê da. Heval, derî yê mala jê re vekir.Bi silavê derbasî jor bû.Jixwe li gel wan rojbaş kem bi kar tanîn,ji bo ku,silav silava xwe de bû,silavê cîhê rojbaşê jî dadigirt.

Hecî bi heval re got:

-Em biçin li derve li xwarinxanê taştê xwe bixwun;li vir ser û pê jî,ev goştê jî xweş çêdikin.

-a dilê te ye, Hecî.

-Berî ya hefteyekî jî ez û tu,em çûbûn,cîhekî me hingiv û rûnê nîvîşkî li taştê xwaribû,dîsa em biçin wê derê çêtir e,Hecî.

-Ji ber ku, li ser hevdû cûna cîhekî nebaş e,bo min jî bo te jî.dijminê min jî zor in,çi qas hê na kes te nasneke jî, bo te jî li ser hevdû cûna cîhekî nebaş e,heval

-kêyfa te ye Hecî…

Heval û Hecî yê zikmeşk,ji malê derketin.li taxsîya ku hecî diajot,sîwarbûn,dinava bajêr de berê xwe dan xwarinxane,ji bo ku sibe bû,hê na her der tenha bû.Ji ber vê yekê zû gîhiştin,xwarinxane.Hecî, av goşt xwar,heval serûpê xwarin.Hecî yê zikmeşk, bê dil destê xwe avet  berîka xwe,lê heval berîya wî destê xwe avete berîka xwe,bi awayekî lezgîn dirav ji berîka xwe derxistin direjî garson kirin…bi hecî re jî:di navberê min te da tu ferq nîne,ha te dirav dane ha min ferq nake…

Hecî ji bo ku garson nasê wî bû,bi awayekî germ,gota garson:

-xwe dê hafiz

-xwede hafiz,hecî

-Heval îro min dixwest ku; ez te li nava bajêr bigerînim,lê li daîre pir karên min hene,ji ber vê yekê, bibaxşîne ez ê rojaka dîn te bigerînim.

-Xem nake hecî.

Heval li kêlaka hecî,li kursîya texsî sîwarbû,ber bi mala ku heval lê dimîna hecî texsî ajot…Di peşîya sê avahîyên fermî re Hecî texsî ajot.Bİi heval re got:ev avahîna;yek a îstîbarate ye,yeka polêsan a,a dîn jî a leşkeran ê,tu li ber wan deran qet negarê çêtir e,li heman deme de,nebe ku tu dîmênên wan deran bikêş e,dîmenê wa deran kêşan qedexe ye,ciza ye xwe jî dizagonê me de girane û li herdereka van avahî yan jî kemera hene…

-Spas Hecî, ji bo agahî û hişyarîyên te.

Heval li bêr derîyê mala  partîyê komunê ji texsîyê peya bû.wexta ku xatirê xwe xwest gotaHecî, heval:

-Em ê ser danê evarê biçin mala te,nîvro jî ez ê bo te firawîne bînim.

-Spas Hecî.

Hecî, ji nik heval çû.Heval dîsa ma bi serê xwe tenê.lê belê, ew roja ku heval edî biçe mala xwe ji bo heval ne rojeka bi weswese bû;Rojeka bi hesan bû,rojeka xweş bû. Heval, heya nîvro bêhna xwe veda…lê ;wexta ku, Hecî yê zikmeşk firawîn bi heval re anî,ew hesanî ya rojê,xweşikîya roja,disa şuna xwe bi weswese re hişt…Hecî yê zikmeşk; wexta ku; hatibû cem heval,li devê dêrî yê xanî piştî silavê bi heval re gotibû;pêwîste em mala te biguherin,pêwîste em xanîyekî ku cîh wî ji bo ewlekarî ye baş ji bo te kîra bikin.herdûyan bi hevdû re li ser masa yê sifre danîn,pêkva dest bi xwarinê kirin…

Wexta ku, Hecî; behsa  guherandina mala kir.mirûzê heval nişke ve tirş bû.Hecî, bi vê yeke hesîya,ji heval pirsî;ji bo çi mirûzê te tirş bû,heval?Me, di xizmet de hin kemasî kirin?

-Na;Hecî, we dixizmet de tu kemasî nekirin,ez ji we pir memnûn im.min bibereka ka pir tuj xwar ji ber vê yekê mirûzê min tirş bû.

-Min ji, got qey; me di xizmet de hin kemasî kirin.Eger ku dilê te naçe kebabê, ez biçim xwarineka dî bi te re bînim.

-Spas Hecî; ez ji vê xwarine gelek memnûn im.

-Hecî depozîto û kîra çi qasî ne.

-depozîto,pêkane heft an jî heyşt mîlyon tumen;kîra jî pêkane ku, sed an jî sedûpêncehezar tumen bin.

-Ma qey her taxakê depozîto û kîra wek hevdû ye…lê, li hin taxan bihatir, li hin taxan jî ne erzantir e?

-Belê heval; li taxan depozîto û kîra ya avahîyan gelek biha ye,Hin taxan jî erzantir a.Li hin taxan yên wek me nikarin rûnîn.li wan  taxan yên ku cuzdanê wan tija dikanin rûnîn.

Heval dev biken ji hecî pirsî:

-Ma,çi qas biha ne?

-Depozîto;  deh an jî panzdeh mîlyon tumen,kîra jî  ji sêsed hezar tumenî heya pêncsed hezar tumen yê biçe…

Hecî, ji cem heval çû.Heval, ji ber depojîto û kîra ya,pir bêjar bû.Jixwe gel heval tene sê mîlyon tumen hebûn.heval ji ber depozîteye  keta nava fikaran;yê ew qas dirav çawa peyda bikirina? Sê çar kes hevalê berîya wî bi wî dane nasandin hebûn. Ji bo ku careke, an jî  dû caran dîtibû cîhê mala wan,lê belê jî cîhê wan malan jî dernedixist.Eger ku; malê wan derbexistiba jî yê bi heval re alîkarî bikirina,an jî nakiribûna,ev yeka jî hêna ne dîyar bû. Ji hevalên xwe xwestin jî ne gora ehlaq û nirxên wan bû.pêwîstbû;heval bi xwe mesrefê pêdivîyên xwe peyda bikiriba.Wextê ku; diravê zêde bi dest ketin jî ewanê jî rêbikira hevalê xwe.

Di nava van hizir û fikaran de heval nizanî çawa wext derbas bû.   Wexta ku, Hecî;  bi têefone xeber da heval,gota heval; ez ê bêm te bibim mala te, heval zanî ku,roj  ava bûye.

Hecî piştî çand xûlekan hat li zangê derîyê hewşê xanî da,gota heval;em biçin berê li xwarinxane ke xwarin ê bixwun,paşe jî ez te bihêlim mala te.

Heval sipasîya Hecî kir,gotê;Dilê min naçe xwarine em biçin mala me çêtir e.Hecî jî; gora heval tevgerî ya.heval bir mala komuneye ku heval lê dimîne.Li ber derî yê malê; bi Hecî yê zikmeşk re got:

-Kerem bike jor, Hecî.

-Spas heval;ez ê biçim malê,zarok li benda min in

*****************

Heval derbasî jor bû. Lê, pir bi fikar û weswese bû.Dilê xwe nediçû ne xwarine,ne jî vexwarine…Telewîzyon vekir. Lê,di telewîzyone de çi dihata weşandin temaşe nedikir. Di telewîzyonê de çi dihateaxaftin guhdarî nedikir.heya derengîya şevê bi wî rengî ber telewîzyone rûnîşt,li ser kursî ye.her di fikirî; ez ê kê pere mala nû yê ku kîra bikim ji kê bixwazim? ji ku derê peyda bikim ?ez biçim nik kê ji kê pere mala yê kîrayê û depozîto yê bixazim?... ji ber vê yekê ,wê şevê qet ne nivist,heya siberoj.xwêdane dipişta wî re avet,di nava nivînan de her gewîzî û gewizî…Siberoj dilê xwe de got;ew du kes hene,ewanê ku,dewla serê pkk cuzdane xwe miştkirî, cuzdanê xwe dagirtî… Ewane ku;di her civate de bi navê partî diaxivin,ewanê ku,di civatan de dibêjin;ji bo serok APO,PKK KURDİSTAN namûs jî têde em ê ji bo SEROK APO PARTÎ Û GEL hertiştekî xwe feda bikin…

Siberoj;wexta ku ji nav nivînan derket çû destşoye kêlîyekê serê xwe da ber ava cemîdî, çay ji bo xwe hazir kir.Bi panêr û çand zeytûnan xwurînî ya şkenand. Berê xwe da,ew her dû qaşo dostên PKK…Ewan ê ku, dicivatan de diaxifin dibêjin;emê namûs jî tê de her tiştekî xwe ji bo serok APO,PKK, GELÊ KURD Û KURDİSTAN'ê feda bikin.

Heval , di wextê cida de çû mala herdû qaşo dostan.Herdûyan jî; wek hevdû heval pêşwazî kirin. wexta ku heval dîtin heval bê dil pêşwazî kirin.heta heval herdûyan jî li ber derîyê mala xwe demeka dûrûdîrej,li ser pîyan dane sekinandin.bersiva herdû hîz û dizan jî ji bo heval wek hevdû bû.Herdû yan ji bi heval re gotin:
-destê me gelek tenge,bezîrganî yê qet nabe,em ê zarokên xwe bi kotegî,bi deynan xwedan dikin.rewşa Îran ê jî edî li hemberî we nebaş e,ji ber ku,PJAK bi alî yê we de hate damezrandin,edî çavên komara îslamî her li ser me ye,tu bi xwe jî dizane,li Îrane derdekirin heye,edî tu jî yekcar neye mala me,em ê kêfxweş û minêkar bibin.Tu bo ji me diravan dixwaze,diravên we pir in, ji hevalên xwe bixwaze hê na çêtir e.

Heval ji cem wan bi mûrizekî tirş rabû;bêdil xatir ê xwe ji wan xwest û berê xwe da mala ku lê dimîne.

Heval, piştî ku helwesta ewanê bi axaftinê dost,di kiryarê de ji dijmin bi tehlûke bi çavên serê xwe dît û bi gûhê xwe jî bîhist berê heval hîna girantir bû;ji alî yê hizir,fikar û kiryarê de…Heval her bi xwe re di nava nîqaşê de bû.heval xwe bi xwe re digot;eger ku dostanî ya wan ev ê, bila ev dostanî di binê erdê kefê, bila dostên wisa nebin hîna çêtir e.dijmin ji dostên wisa çêtir e.Mirov dizane ku, dijmi çi ye.Lê, mirov nizane ku kêngî zilamên wisa ye hîz û diz helwesta wan yê li hemberî çi be?berî ya helwesta wan ê ku,hem tu alîkarî bi heval re nekiribûn,hem jî ji heval rû yê xwe badabûn,bi heval re… Bi heval re gotibûn;careka dîn neye mala me,heval ji wan gelek bêjar bibû.Lê belê,piştî demekê heval ku hîna zêdetir li ser helwesta wan hizirî,bezarî ya heval şûna xwe bi kêfxweşî ye re, bi dil şadîye re hişt.ango heval ewana naskiribûn,berîya helwesta wanê nehînî heval di bin bandora axaftinê wan de bû.Ew axaftina wan ê ku, digotin;namûs jî tê de em ê bo SEROK APO,PKK,GELÊ KURD Û KURDİSTANÊ hertiştekî bidin…heval bi xwe re di der heq ê wan de edî dev ji monologan berde,heval ewanê edî ji dijmin jî bi tehlûke dihesibandin.edî heval yekcar ji wan bawer nedikir.

Heval  bi wan hizir û fikaran bi texsîyeke sîwar bû.lê piştî ku li texsî yê sîwar bû,çand deqîqan şofêrê texsîyê  di bin çavan re her li heval dinêrî û şofêr ji heval dev biken bi zimanê azerî pirsî:

-Hesapları birbirine katıksan!(te hesap tevlîhevkirine)

-Na hecî min hesap tevlîhevnekirine,ez îro pir xebitîm,ji ber vê yekê ez gelek westîyayîme.

Şofêr bi serê xwe wek bêja;ji her halê te dîyare  ku,pirsgirêke te ye kur û giran hene,tu ji bo çi ji min înkar  dike?bi devkî jî ji heval re got:bila gotina te be…lê, ji her tevgera şofêr eşkere bû ku şofer ji bersiva heval ne kane ye…

Şofêr, heval cîhe ku heval xwest jî texsî ye peya bibe,texsî da sekinandin,heval ji texsîye daket xwarê:

-xwedê hafiz, Hecî.

-xwedê hafiz,bira.

Di pîyaderê de, wexta ku; heval ber bi mala xwe di meşîya,çand kesên ku di piyaderê de di meşîyan her li meşa heval di nêrîn.wexta ku heval bi vê yekê hesîya,xwest derbasî alîyê rêka asfaltê yê dî bibê,nişke ve xwe avetê ser rê yeasfalte,di vê kelîye de texsîyeke hindik ma heval bipelixîne,şofêr texsî da sekinandin,bi zimanekî nerm bi heval re got:

-Ma, bira tu dixwaze bimire,tu ji cane xwe bêjar e?tu, bi xwe re serê min jî têxe bela ye,ew qas zorakên min hene,tiştek bihata serê te, kê ye zarokên min xwedan bikirina?Vê carê tiştek nehate serê te xwedê tu parast,careka dîn ku, tu di rêgayan re derbas bû derdora binêra,piştre derbas bibe…

-Spas Hecî,gotina te ye…Ji min biborîna.

-Çi nîn e,bira,li ser tu tuneyî ye,min pêla te bikira,tu birîndar bibûya an jî te jiyana xwe ji dest bida,heya heya wîcdana min rihet nedibû,careka dîn di rêyan re wisa nameşe.

-Careka dî spas hecî,min bibaxşîna…

Heval, piştî vê bûyera ku; hatîbû serê wî û axaftinê şofêrên giranbiha xwe avet mala xwe.jixwe mala ku heval li dima nêzîkî cîhê bûyere bû.

Heval, heya siberoj hizîrî li ser depozîto û kîraya mala nû.çand caran xwe di nava nivînan de dirêj kir.lê, qet xewa wî nedihat.kêlîyeke xilmaş dibû lû piştre xişyar dibû.yekcaran derdiket hewşe digerîya.Bi vî awahî lê bû sibe.çayeka xwe keland,bi hin penêr bi çand zeytûnan xwurînîya xwe şkenand.Nişke vê;  zana û Zînê hate bîra wî! Hevalan ewne bi wî dabûn nasandin.Ji bo tevgara azadîyê gelê kurd pir ked û berdêl dabûn.Herdû jî, canfedane ji bo azadîya gelê kurd xebitîbûn û hê na jîdixebitîn.Ne  tenê wan ji bo PKK xizmet kiribûn; ji qeçexwanan heya hemû tevgerê kurdanê dîtir,ji fedaîn xelk heya mucadîn xelk xizmeta gelek tevgeran kiribûn.Ji wan hemû,li mala Zana û Zîne bibûn mêvan,xwarina wan xwaribûn,li mala wan bêhna xwe vedabûn,din ava nivînên wan de nivistibûn.sohbeta wanê xweş,ya ku mirov qet ji têr nabe guhdarî kiribûn.jixwe herdû jî wek hevdû zana,jêhatî  bûn.Mirov ji her axaftinê wan têr nedibû.Ji axaftinê wan pir gelek sûd werdigirt.axaftinên wan pir giranbiha bûn.

Zana, kurdekî ji binamaleka Êzîdî bû.Zînê jî, ji binamaleka Asûrî bû.herdû ji hatibûn ser dînê misilman.Mirov di kesayeta wan de  taybetmendîyên  Êzîdîyan û Asûrîyan jî didît.Zana pir yekî

dilnizm,xweşbîn,jêhatî û wek navê xwe zana bû.Zîn ji Zana jî zanatir bû.mirov bêja yek ji a dîtir zanatir bû hîna çêtir e.Zîn pir kêrhatî,çalak,dilnizm,destsivik bû.

Bejna Zana bilind, pişta wî zirav difna wî wek nikilê teyrê baz,xwînşîrîn û çîl bû.Di ser zîne re ji alî bedewî ye mirov li derdora wan jin nedidîtin.Zîn esmer,levên we tenik,eyna wê tevî dayika pênc zarokan bû jî qet nequrmiçî bû.Zîn tevî ku dayika dû law û sê keçan bû jî wek bûkeka teza xûyanî dikir.

Zewaca wan wek mirov hin darên mêwe aşila bike, lê hatibû.wek mirov darên sêve,darên xoxan aşila bike lehatî bû.Zarokên wan nîşana vê yekê bû.zarokên wan yek ji a dîtir xweşik tir,zanatir,kêrhatîtir bûn…

Her astengîyan di jîyane de derketibûn pêşîya wan jî ji bi feraset derbas kiribûn.Dû kur û dû keçan zanko li ûrmîyê dixwendin.keça wanê herî biçûk navê xwe Sîsê bû.Sîsê şeş salî bû.lê, ew qas biaqil bû ku,mirov digot qey mezin bûye paşe dîsa bûye zarok.jixwe têgotin dilê zarokan pir paqij a.lê, dilê sîsê dinava hevsalê xwe de yê herî paqiş bû.Sîsê wek nava xwe sîs bû.difna we biçuk bû.çavên wê reşbelek bûn.nenûkên we ew qas xweşik bûn ku mirov dixwest her li nenûkê we binêra.dayik û xwişkên wê wexta ku karek dikirin we jî hema dest diavet wî karî,mirov dixwest ku karê ku ew dixweze bike temaşe bike…

heval di mejîyê xwe de; bi wan şanesekirinên Zana,Zînê û Zarokên wan xwe ji mala xwe derket.Destê xwe li texsîyêke hejand.texsî sekinî. Heval gota şofêr bibe filan taxe,şofêr bi serê xwe gota heval; baş e,ez ê te bibim.

Heval, ji taxa ku; mala komunê heya mala Zana û Zînê şofêr re qet axifî,ne jî derdora xwe mezekir,her çavên heval li rêke asfalt bû.Heval, wexta ku şofêr gotê; em hatin taxa ku dibêja,pêhesîya ku hatine taxa ku mala Zana û Zîne… Heval destavet berîka xwe,diravên ji bo ku diravên şofêr bidê;şofêr gotê,bi zimanê Azerî qebilî yoktu.(nexweze,pêwîstnake)Heval ji gota şofêr; memnûn,tu zarokan xwedan dike, diravan bigira.Heval bi şofêr re got:

-xwe de hafiz,şofêr bi vê gotinê heval bersivand û heval ji texsîyê peyabû.Berê xwe da mala Zana û Zîne…Nêzî mala Zana û Zînê deh panzdeh xulekan derdora xwe nêrî.Heval, ji xwe wextê ku diçû sedana maleke her li derdora xwe dinêrî,ji bo ku, kes wî dişopînin an jî naşopînin jî, li paş xwe dinêrî.Bi wî awahî heval xwe li ber derîyê hewşa mala Zana û Zîne dît.Bi heyacan û bi coş li zenge derî yê hewşê da.

Derî Sîsê vekir.heval bejna xwe xwar kir, her dû hinarikên rûyê Sîsê maçî kirin.Sisê bi lezûbez bazda jor,qet bi heval re negot tu çawanî, tu baş e jî.Jixwe Sîsê wextê ku heval didît,çand deqîqan ji ber coş û heyacana dîtina heval nediaxifî.Vê carê jî wisa kir.Qet bi heval re neaxifî,berîya haval,li pêşîya heval derbasî jor bû.komandoya telewîzyonê girtê dest xwe her kanalê têlewîzyonê zivirandin.

wexta ku, Heval; keta hundirê malê, dayîka Sîsê û xwişk û dû birayên Sisê li malê bûn. Berîya hemûyan dayîka Sîsê Zînê xêrhatina heval kir, bi hemû heza xwe destê heval guvaştin, paşê xwişk birayê Sîsê.

-Tu, bi xêr hatî Heval,tu çawan ê?

-Sax be .Hûn çawa ne, Zana û zarok çawan e?

-Şêrên serê çîyan çawan e?

-Hemû vê gavê bê belane.rewşa wan baş e.

-gêrîla hertiştekî mane,dil canê ma ne.

-Sax be.hemû baş in.Zana ji, bêhnaka dî yê were,derket devre.karekî xwe hebû.Bi min re gotûbû; di heman deme de ez ê bizirim ,eger ku kesî ez pirs kirim,bila li mala li banda min bimîne…

-jixwe, ez ê jî li banda wî bimînim.

Zîn jineka gelek fêhman bû.di heman deme de ji heval pirsî:

-Wek pirsgirêkeka te hebe ,wek derdekî te hebe?

-Belê,derdekî min heye;lê belê, ez çawa vebêjim ez jî nizanim…

-Dostanî û hevaltî, ji bo çî ye?Eger; em bi hevdû re nebin alîkar,emê çawa kurdistanê rizgar bikin gel jî azad bikin.

-Gotina te di cîh da ye.

-Kerem bike; tu, derdê xwe bi min re vebêja,dibe ku em bi derdê te re bibin çare,heval…

-Ez ê, mala xwe biguherim.Ew mal edî eşkere bûye,lê perê min te re nekin.Ew dû qaşo dostên me hebûn, ewne ku bi bezîrganîyê re mijul dibin,ez çûm cem wan min ji wan jî xwestin ew pere ku pêwîstîya min pê heyî,lê wan hem tu alîkarî nekirin,hem jî rûyê xwe li me badan.Gotin min careka dîn edî neyên malên me…

-Ewne hîz û diz… Ewnê ku li ser pişta PKK cuzdanê xwe dagirtine,ewnê ku li civatan dibêjin;namûs jî tê de her tiştekî me ji bo serek APO,PKK Û KURDİSTAN' Ê  YE?

-belê ewne ku tê nasîn.xwika min Zînê

Heval û zînê; wexta ku, bi hevdû re diaxifîn Sîs jî qet rihet nedisekinî.Her kanalê telewîzyonê diguherîn.çand caran dayîka sîsê Zînê bi Sisê re got:

-Keça min wisa neke,ûz(rû girtin) nabe,tu heval bêjar dike,lê Sîsê qet nedisekinî.

Ji neçarî Zinê, komando ya telewîzyone ji dest Sîsê girt.Sîsê mirûzê xwe tirş kir, li ser kursîyê rûnîşt.Di wê kêlîye de Zana kete hundîr.Ber bi heval çû, bi hemû heza xwe destê heval girt û heval hembêz kir,ji parsûyên heval dengê qirç qirçê hat,lê heval ji nêzikatîya Zana pir kêfxweş û dilşad bû.

-Zû de tu; nehata cem me.Ji bo te em ketin nava fikarên,lê belê, me tu dît,bi dîtina te em pir kêfxweş bûn.Hûn çawan e?Heval çawane,Bi taybet şêrên serê çîyan çawan e ?..

-Spas heval Zana,vê gavê hemû bê bela ne.Li hemberî neyaran jî, gelek serketin bi dest xistine,hevalên gerîla  doşev bi têlefonê bi min re  axifîn.

-Ew êrîşa ku Gerîlayên Azadîyê li dîjî oramara pêkanîne,piştre li Zapê têkçûna hêzên dewletê tirk a leşkerî,ji bo hemû dagirkerênKurdistan ê serketinê mezin û serketine dîrokî ne,Ji bo gelê kurd.Wan serketînan bandoraka êrenî jî li ser yên dagirkerên me jî bike,ez bawer dikim ku li ser dagirkerên parçe me jî kir.

-Gotina te ye bira,ez jî, wek te difikir im.Êrîşa oramara ,destana ku gerîla li zabê bi xwîn,ked nivisandî yê bandora ku êrenî li dagirkeran bike,bi taybet li ser dagirkerên wa,dagirkerên Îrane bike.Di vê mijare de ez jî wek te difikirim.

-Ez bawer dikim ku, Îran di dema pêş de yê sîyaseta xwe yê di der heqê PKK de di pêş çawan re derbas bike,paşe jî biguhera.

-gotina te ye bira yê min e, ezîz Zana.

-ez bawer dikim ku piştî ku SEROK APO dîl hate girtin û radestî dewletê tirk hate kirin,Îran'ê bawer kir ku PKK yê tesfîye bibe,lê belê, edî Îran jî dibîne ku PKK hê na bi hêz dibe…ji ber vê yekê, ez dibêjim; Îran yê sîyasete xwe yê halûhazir di der heqê pkk de di pêş çawan re derbas bike,hê na sîyaseta ka nerm bide meşandin,heval.

-nirxandînê te dibe ku rast û dûrist bin,mijara nirxandine sîyasetên komara îslamî qet ne eşkere ye… lê,ez bawer nakim wek bere Îran nêzika me bibê;dibe ku sîyasetên hişk jî bide meşandin,yê nerm jî…

-ji bo çi, wek berê nêzika me nabe,heval?

-wexta ku,tekîlî yê me û Îranê xurt bûn,PJAK nehatibû avakirin;ji ber vê yekê, edî Îran wek bere nêzikî me nabe.Di der heqê me de her yê edi nava şik û gumanan de be…

-Her parçeyekî Kurdistan ê;hem jî parçe piştî Kurdistana bakur, parçe kurdistanê yê mezin di bin dagirkarîya Îran ê deye,heta bisedsalane di bin dagirkarîya Îran ê deye…Ji hilweşandina dewleta Med an wir de, di bin dagirkerîya Îran ê de ye…

-Belê,bi sedsalanê parçeyekî welatê me di bin dagirkerî ya Îran ê de ye.Îran ê ji, bo berjewandî ye xwe gelek çaran bi tevgerê kurdan yên parçe kurdistanê yê dîtir re alîkarî kirîye.Lê belê, ji bo ku kurd azad bibin ev alîkarîya tu caran nekiriye.Ji bo ku, cîranê xwe ye wek iraq ê,wek tirkî ye zeif biexe, ev alikarî kirî ye.Wextê ku, tevgerê kurdan,kijan tevger dibe bila bibe,ber bi serketine çûye Îran ê, bi dewlete wek iraq,wek tirkîye,dewlete dagirker re peyman îmze kirî ye,bi hevdû re tevgerên kurdan tesfîye kirine.

-Wek îsyana şex Ûbeydûlah,heval.

-Belê kek Zana,gotina te ye.îsyana şex Ûbeydûlah ji, îsyanên gelê kurd îsyaneka bê hempa,bin navûdeng û serekeye .Armanca we îsyana şex Ûbeydulaha yê Nehrî serxwebûn bû.Berîya ku bi serkeve,bi alîkarî ya împaratorîyanê Îranê yê Sefawîyan ku, bi împaratorîya yê osmanîyan re kiribûn dîl hate girtin,împaratorîya osmanîyan jî, Şex Ûbeydûlah surgînê Hîndîstan ê kiribûn.Ez, bawer dikim ku Şex Ûbêydûllah, li wê derê jiyana xwe ji dest da…

-Belê,heval; navenda îsyana Şêx Ûbêydullah ji Şemzînan ê dest pê kir.Tê zanîn ku,şemzînan warê bav û kalê min ê.hê na mirovên min, gundê me û zewîyên me li şemzîzan ê ne.

-Ez dizanim kek Zana,Şemzîzan warê we ye.

Wexta ku;Heval bi Zana û Zîne re diaxifî,Sîsê qet nedisekinî.Sîsê yekcaran diçû xwarinxane firax dişuştin; ji bo ku, balê dê,bavê xwe û heval bikêşa ser xwe gelek deng ji firaxan derdixist,yekcaran firax li hevdidan. Teq reqa firaxan nedihişt ku, dê û bavê Sîsê û heval axaftinên hevdû têbigîhijin.Sîsê,dest ji firax şuştine berda vê carê li bisîkletê sîwar bû;di cîhê ku heval, dê û bavê we tê

de rûnîştî de bi bîsîklete çû û dihat,çû û hat…Dê û bavê Sisê ji ber rêzgirtina heval qet li Sîsê nediheytandin.Jixwe herdû ji gelek bênfireh bûn.Tu caran li zarokên xwe nediheytandin.Li wan nedidan.Yekcaran dayîka Sîsê, yekcaran jî bavê Sîsê vê re digotin:

-Keça min ûz(rû girtin) nabe.heval nerihet neke…lê belê, Sîsê; haya ku heval,dê û bavê ve,edî dev ji axaftînê berdan bi vê re mijûl bûn hat li kêlekê heval rûnîşt.Bi heval re dest biaxaftinê kir,wek yeka mezin dest biaxaftine kir.mirov digot kê Sîsê mezin bûye,paşe jî biçûk bûye:

-Heval; bav  û dayîka min pir xizmetê mezin ji kirine ji bo gerîla.carekê berîya wê çand salan yekî ji nav refê gerîlla bazdabû,bavê min bi texsîya xwe bi dû wî ket, ewa girt nehala teslîma hêzên wan yê ewlekarî yê bibin,ewa girt radestî hevalan kir.Wê wextê; hêzên  Îran ê bi wê bûyêre hesîyanabûn,plaka texsîya bavê min girtibûn.Bavê min; ew texsîya ku bi pênc milyon dirav kirîbû bi milyonek dîrav firot.

 Sîsê nedixwest ku,ne pesna bavê xwe,ne jî pesna dayîka xwe bide.Wexta ku; pesna bavê xwe didapiştre jî pesna dayîka xwe dida.ji bo ku ji Sisê dilê xwe negirin.

-Heval; dayika min ji,gelek caran,tiştên teqamenîyê di bin kincên xwe de li canê xwe giredidan,ji bo hevalan dibirin.Carekê min bi çavên serê xwe dît, sêsed funye di bin fîstanê xwe de, li laşê xwe giredan ji bo gerîla birin çîya.

-Sisê, tu cand salîyê?

-şeş,heval.

-Bi farsî şaş çawa tê gotin?

-Şîş tê gotin heval.

Wexta ku,heval û Sîsê diaxifin; dê bavê sîsê ji axaftina wan bi baldarî guhdarî dikirin.

Wextaku; axaftina sîsê û heval bi dawî bû.dayika Sisê dev biken:

-Keça min tu şeş salîyê,ew ziqûmê bazdayî yê ku bavê te bi dû ketî û girtî paşê radestî hevalan kirî,ji neçarî jî texsîya xwe bi erzanî firotî berîya wê heyşt salan qewimî.

Sîsê; ji wê axaftina dayîka we xiçil bû xwe kerûlal kir. Edî, heya ku heval ji wan xatirê xwe xwest qet neaxifî.

 Berîya ku, heval xatirê xwe bixwaze Zana jê pirsî:

Heval ji bo te; ji bo pêdivîyên te,çi qas tumen pêwîstin?

-Ez bawer dikim ku; nêzî çar pênç milyon tumenê min hene,sê milyonê dîn jî hebin yê te re pêdivîyên min bikin.

Zana; çû ji mezelekî dîn dirav anîn dan dest heval.Bi heval re got:

-Eger ku tê re nekir,were ez ê hinê dîn jî peyda bikim.

-Spas kek Zana.

Heval; yekû yek destên hemûyan guvaştin,hinarikên  rûyê Sîsê jî maçkirin.Zana,Zîne û Sîsê heya ber derîyê  hewşê heval birêxistin.

*********************************

Heval ji, mala Zana derket. Ew qas kêfxweşbû ku ,qet li texsîyê jî sîwar nebû,wek bayê kûr xwe avet mala xwe.Di rê de qet li wêneyan,li mirovan û li wesaîtan jî temaşe nekir.Bi wî awahî xwe avet mala xwe.mala komunê,lê, mala ku heval bi serê xwe tenê lê dimîne …

Ji evarî heya derengîya şevê; li ber têlewîzyone,heval helwesta Zana,Zîne û ew herdû hîz û dizê ku,di civatan de digotin namûs ji tê de hertiştekî me ji bo SEROK APO,Jİ BO PKK Û Jİ BO KURDİSTANÊ gorî ye.

Heval, vê şevê bê fikar nivist.sibê ku  tava rojê ku da pencerê xanîyê wî  da,ji xew hişyar bû.Jixwe, wextê ku; tava rojê deh panzdeh werîs bilind dibû,li pencere ku heval tê da nivist dida. Ji ber vê yekê heval zû hişyar dibû.Piştî taştê, dest bi karû barê xwe ye rojêne dikir.Bi piranî bi şev ji bo karên xwe ye rojane nexşeye xwe çedikirin.lê, we rojê tu nexşe ji bo xwe daneanîbûn.

Heval ji; bo ku diravên depozîto û kîrayê peyda kiribûn, pir kêfxweşbû.Di dîlê xwe de digot îroj derkevim nava bajêr bigerin.heval di nava bajêr de ger di dilê xwede dibir dianî,zengê têlefona wî leda:

-Silav heval,tu çawa yê ?...

-Silav Hecî, ez baş im.

-Heval, ez piştî çaryek deqîqan li nik te me.

-Ser seran,ser çawan Hecî.

Nexşeya ku; heval, di dilê xwe de danîbû,bi têlefona hecî yê zikmeşk di ber dilê heval de mabû…Heval ji bo ku, ew rojê Hecî yê zikmeşk li pêşîya gera wî bibû asteng  gelek ji hecî bêjar bibû.Ji neçarî, li benda Hecîyê  zikmeşk ma…

Hecî,  hate mala heval. Piştî hal û xatirê hevdû pirsîn, gota heval; em ê îro mala te bigûherin.

-mal li ku derê ye,Hecî ?

-Li taxeka bi ewle ye.

-depozîto çi gas e,Hecî?

-Pênç mîlyon dirav.

-Kîra çi qas e,Hecî?

Wexta ku;Hecî, pere depozîto û kîrayê bi heval re gotin,edî heval bêhna xwe berda…Ji bo ku, pere heval têra depozîto û kîraye dikirin.

-Em, biçin mala we ye nû.Eger ku, tu pê qayîl bû,em, pere xwedî yê mala bidine,îro tiştên we bikêşin mala nû…

-Baş e hecî…

Heval û Hecî; ji bo Hecî mala nû nîşanî heval bide derketin derve.Ji xwe mala nû nêzî mala kevn bû.Bi texsî ye di deh banzdeh deqîqeyen de gîhiştin mala nû.Mala nû, ew qas mezin bû ku,têra malbata ka qelebalix dikir.Hewşê mala nû ewqas mezin bû ku mirov dikanî tê de fûtbol bilîze.Di hewşe de, darê mêwe jî;wek dara tû ye,hêjîr,xox,mevê tirî hebûn.

Avahî ya hevêlê nû dû qat bû.Rê di kêleke re diborî.Tu kemasîyên avahîye tunebûn.Kalorîfer jî têde hertiştekî avahîye hebû. Hevalê ku bi salan dinava şertû mercên giran de jîyayî re;ev avahî wek qesre ke bû.Hevalekî bi salan di kokê daran,dibin kevir û zinaran de yekcaran jî di bin barane de, bê baranî û bê parke û ê qetek naylon jîyayî re wek qesre ke dihat.

Her jîyana heval û jîyana hevalê wî, vê gavêdi pêş çavan wî re wek fîlmekî diçû,dihat.Jîyana hevalê ku, li bakûrê Kurdistanê ,di nava bajaran de borî jî,jîyana wî yê şoreşgerî jî, her li pêş çavên wî wek filmekî diborî…

Heval dinava van xemû xeyalan de bû ku;Hecî ye zikmeşk,gotê:

-ez bawer dikim tu çû çîya cem hevalê xwe û tu vê gavê zivirî…

Heval devbiken:

-Raste Hecî; hevalên li serê çîyan hatin bîra min…

-Em biçin mala we ye kevin,ez ê biçim karmendan jî bînin,wextê ku karmend hatin, tu dimezelekî de(ode) rûna,bila karmend te nebînin…Heya ku; ez bi karmendan re zivirî me,tu tiştên ku, em li gel xwe bibin,tiştên ku em radestî karmêndan nekin, hazir bike, em li gel xwe bibin…

Heval û Hecî ye zikmeşk, bi hevdû re ji mala nû derketin,berê xwe dan mala kevn yê komunê yê…Hecî li ber derî yê malê, heval peya kir.Gota heval:

-Tu derbasî jor bê…Ez ê, biçim karmendan bînim.Wexta ku; min zengê derî malê xist,tu derî veke û biçe mezelekî ku tiştên ku ez û tu li gel xwe bibin,ji bo ku karmend, te nebînin…

Hecî çû. Nêzîkî nîv saete li nik xwe bi deh karmendan ve zivirî.Li zengê malê da.Heval derî jê ra vekir û heval derbasî mezelê(ode)ku karmend wî nebînin bû…

Karmendan di sê çar saetan de hemû tişt birin mala nû.Wexta ku; karmendan tişt veguhestin mala nû; heval, di mezelê ku xwe veşartî de qet ne liviya.Piştî ku; mal hate vala kirin,Hecî yê mezin hate cem heval:

-Me, hemû tiştê malê bir.Ez jî, li gel karmendan,wexta ku tişt dibirin , her carekê çûm û hatim… Me, mala te jî raxist.Edî, em tiştên ku li livir mayî jî biavêjin texsîyê,em jî biçin…

Heval û Hecî, rahîştin tiştên ku radestî karmendan nekirine;avêtin paşîya texsî yê…Heval, li peşî ya texsîye rûnîşt,wêne ye serok APO jî kir hembêza xwe…Hecî çand caran di bin çaven re li heval nêrî û nêrî,paşê jî ji heval pirskir:

-Heval, ew çi ye?Te, bi hemû heza xwe ew hembêz kirîye?

-Wêne ya Serokê me ye…

-Dayne qursî ya dawî ye…

-Ez wisa nakim, Hecî. Em ji her  her alîyekî deynderê serokê xwe ne.Tiştên malê ku; hemû jî winda bibe,heta ku hemû jî bê dizîn,ji bo min jî, ji bo hevalên min jî xem neke,lê, ev wêneyê serokê me bikeve,bişke,winda bibe wê wextê ez xwe efû nakim…

-Ez, bawerdikim ku; tu ji, wek hevalên xwe gelek dilsozê serokê xwe ye.

-Belê Hecî, ez dilsozîya xwe nikarim vebêjim…

-heval tu, dixwaze li kîjan mezelî wêne ye serokê xwe deyne?..

-Mezelê ku; ez, tê de bixebitim û di heman demede jî têde razem…

-Baş e, ez bitere alîkarîye bikim; em, wêneye serokê we deynin cîhê ku, tu dixwaze…

Bi alîkarîya Hecî ye zikmeşk; heval, wêne yê serokê xwe danî cîhê ku ewa her tim bibîne

Ji bo ku; heval bi tenêbû,bilî Zana û Zîne kesî dîn ye ku heval di rojê tengav û pirsgirêk giran de  pê bişewra hîna tunebû li gel heval,heval di dilê xwe de,bi xwe bi xwe re digot:

-Bila, her awirên serok, li ser min bin ku; ez tu kemasîyan nekim…

Piştî dervekirina wêne ya Serok,heval Hecî re got:

-Hecî; em biçin bi hevdû re şîva evarî bixwun.Ji bo xwarin û vewarine hecîye zikmeşk gelek çilek bû.wexta ku behsê xwarine dihate kirin,Hecîyê zikmeşk her  tim hazir û nazir bû.

-A dilê te ye,heval…

Heval û Hecî bi hevdû re derketin derve,Hecî  ji heval pirsî:

-Em biçin kîjan xwarinxane?...

-Kîjan ku bi dilê te ye em biçin wê derê…

-Em biçin pîza bixwun çêtir e…

-Baş e Hecî.

Hecî zikmeşk, heya ber xwarinxane yeka pîzayan di nava bajêr de heval bir. Derbasî  xwarinxane bûn.Hecî, berîya ku garson bê, ji Hecî û heval daxwaza wan pirsbike,Hecî ji heval pirsî :

-Tu yê pîza ye mezin bixwe,an jî a biçûk?...

Heval, ji bo ku çilekîya Hecî dizanî,gota hecî:

- tu kijanê dixwe,ez jî yê we bixwum…

Di wê kêlîye de, garson hate cem wan,gota wan herdûyan;kerem bikin daxwaza we çi ye,hûne çi bixwun,çi vexwun?...

Hecî gota garson dû pîzayê mezin û ji bo min dewekî,berê xwe jî daheval:

-Tu ye çi vexwe?...

-Ji bo min jî dew…

Garson pîza anîn.Hecî, heya enîşke keta ser pîza yê. Hîna heval pîza ya xwe bi nîvî nekiribû,Hecî pîzaya xwe xilas kir.heval, gota Hecî:

-Yeka dîn bixwaze…

Li gel Hecî; ji alî xwarin û vexwarine qet şerm tunebû;Wextê ku; xwarin dihata pêşîya wî,nedigot; ka ne a min ê,lê kadîn jî ne ya minê…Ji ber vê yekê zikê wî wek meşkekê lê hatibû…

Heval û hecî yê zikmeşk, pîzzayê xwe xwarin.Bi serde dew vexwarin.Çûn cîhê kasîyer; Hecî, dest aveta berîka xwe, lê, destê Hecî qet ji berîka wî derneket.Heval ji berîka xwe pere derxistin dan kasîyer û herdû ji pîzzavan derketin.Bi texsîya ku Hecîyê zikmeşk diajot berê xwe dan mala ku,heval tenê têde dimîne…

Di rê de hecî yê zîkmeşk bi heval re got:

-Siberoj ez û Hecî Selîm,bi hevdûre bên serdana te…

-Ser seran ser çawan, Hecî

***********************

Heva, qet ji Hecî Selîm heznedikir.Hecî Selîm, wexta ku; diaxifî mirov digot kê sayek direyî…Ji ber vê yekê; heval qet nedixwest ku hecî Selîm bibîne,lê belê, yekcaran ji neçarî bi wî re rû bir û dima.Jixwe hecî Selîm jî kêfa xwe qet bi heval re nedihat…

Siberoj; hecî Selîm û hecî yê zikmeşk, hatin nikheval.Heval pêhesîyayîbû ku,Hecî Selîm, bila sebeb serdana wî neke…heval xêrhatina wan herdûya kir.Hecîye zikmeşk; bilî pirsîna halûxatirê heval di ve hevdîtine de qet neaxifî.Jixwe, li gel wan adet bû;yekî payabilind ku, li cem yekî nepayabilind diçûn serdana yekî,her yê paya bilind diaxifî,li gel heval jî adeta wan wisa bû.Hecî Selîm diaxifî,Hecîyê zikmeşk jî bi wî re mêwe diqeşartin.lê, we roje Hecî Selîm ne mêwe xwarin ne jî tiştek vexwar…her mirûzê wî tirş bû.berîya ku ji cem heval rabin;Hecî Selîm bi heval re:

-Em edî rabin,edî tu jî li gel me nemîne;tu biçe bila hevalekî dî bê cîhê te…

Wexta ku,hecî Selîm gota heval;tu biça, bila hevalekî dîn bê cîhê te,xwîn herîkî mejîyê heval…heval pir bi hêrs bû.Gota hecî Selîm:

-Ji bo ç,i ez ji vir diçim?Hîna sê heyvên min jî nebûne ku ez hatime vî wezîfeyî,hevalê ku berîya min li gel we peywirdar du salan li nik we ma ji, bo çi ezê di demeka kurt de ji vir biçim?Sedema vê yekê pêwîste; tu, bi min re vebêja? Ev helwesta we ne ez; ne jî hevalên me ye dî qebûl dikin…

Heval careka dî bi hecî Selîm re:

-Ji bo çi, hîna li gel we;min sê hêyf jî derbas nekirine, ez ê biçim?Ez dixwazim; sedema vê yekê bizanim?...

-Di navberê me û we de peyman wisa ye…

-Eger ku;di navberê me û we de peymana ke wisa heye, hevalên ku berîya min li cem we peyvirdar ji bo çi li vir bi salan li vê derê peyvirdar man?...

-Kîjan hevalên we,yê ku wek te li vir  peyvirdar bi salan ma ne?

-Mînak filan filan heval?

-Ew ne raste,kes li cem me bisalan nemaye.

Heval têgîhişt ku;hecî Selîm hinê dîtire wek wî nexwazin heval li cem wan bimîne…Lê,heval dixwast ku sedema vê yekê bizanibe,careka dîn bi hecî Selîm re got:

-Ez dixwazim sedema vê yekê bizanibim;ji bo çi, hûn dixwazin ez jî vê derê bi lêzû bez biçim?Bi taybet jî ,ji bi çi tu dixwaze ez ;li gel vê nemînim,hema biçim?

-Tu, qet bi me re alîkarî ye neke:Tu agahîyan nede me,taybet di der heqê PJAK é de,ne cîhê wan,ne jî dixwazin çi bikin?Çi qas hêza PJAKé he ye, qet tu tu agahîyan nede me?Ji ber vê yekê, em dixwazin; tu ji cem me biçe yekî dî bê cîhê te…

Wexta ku; hecî Selîm ev gotina, bi heval re gotin heval pir bêjar bû. Bi hêrs  bi hecî Selîm re ,wek li hecî Selîm bi heytîne gota wî:

-Ma qey ez bi we re sîxurtîye bikim?ma, hûn di der heqê xwe de agahîyan di din me ku, ez jî, di der heqê me de agahîyan bidim we?Ew tiştên ku tu dibêja li pirtûka me,di adete me de nehatîye nivisandin…Ez ê, hema bi hevalan re xeber bişînim,Bila hevalekî; ji bo cîhê min hazir bikin.Ez  ê bi lez û bêz ji cem ve biçim…

-A baş,ev gotina te ye got û hecî Selîm rabû ser pîya;destê heval jî neguvaşt,bi Şiklekî bê dil bi heval re got ;xatirê te ev li pêşîyê ,hecîyêZikmeşk jî li dû wî jî malê derketin,çûn…

*************************

Piştî çûyîna herdû ziquman;heval li ser helwesta wanê nehînî pir hûr û kûr bû.Heval her li ser helwesta wan pir ponîjî,ponijî…lê, qet tênegîhişt ku bo çî vê re dibêjin; ji vir biçe,bila hevalekî dîn bê cîhê te…Di vê helwesta wan de heval heval tiştêk têgîhiştibû;ew jî wan bi devê serê xwe bi lev kiribûn;daxwaza ku hecî Selîm bi heval re gotîbû;ew  daxwaza ku,ji heval agahî dixwestin,taybet di der heqê   PJAKÊ de û dider heqê agahî xwestina wan bû…Ev daxwaza wan ji bo heval nepêkan(gengaz) bû…

Heval, wê rojê biryar da xwe ku; dotira rojê biçê cîhê şewrê,mala Zana û Zînê…Wextê ku; heval di mijarekê de asê dibû,çare nedidît,bo şewrê diçû cem Zana û Zîne…mala Zana û Zîne tenê ne cîhê şewrê bû ji bo heval diheman demê de cîhê coş dilşadî yê bû jî…

Derîyê hewşa malê bi heval re, Sîsê vekir.Sîsê, wê rojê xwe xemilandibû. Sîsê,We rojê wek gulekê bû;wek guleka xweşik…Fenîlek li xwe kiribû; lê, dû,sê deqîqan careke her milê fanîlê ji ser gurmiskên milê xwe yekî dişemitandin.Ji bo ku, heval jî guhdar bibe digot;ax!ax!heval hûn nizanin, em, li Îranê çi dikişînin,nahêlin em azad kincan li xwe bikin,nahêlin em xwe bixemilînin…ji gotin û helwesta Sîsê heval matmayî dibû,lê pir jî ji zekîbûna we kêfxweş dibû…heval çand caran hinarikên rûyên Sîsê maçî kirin…Sîsê biheval re:

-Heval, li mala mêvan hene;bila te nebînin,heya deh deqîqan yê rabîn ….Li embara qût bisekina ku,mêvan rabûn, ez ê werim ez û tu,em ê derbasa jor bibin…

Sîsê, çû jor. heval jî, di embara qût de li ser çûwalekî pirinçê rûnîşt.Heya ku, mêvanên wan rabûn…mêvan, ji jor rabûn dayîka Sîsê û Sîsê jî li gel mêvanan, heya ber derîyê hewşê mêvan birêkirin.Lê, dayîka Sîsê her kêlîyekê; bi her dû mevanên jin re digot hîna zû bû, hûn rûnîştina…Her ku dayîka Sisê bi mêvanên xwe re digot;hîna zû bû hûn bimana,Sîsê jî ev gotina dayîka xwe dûbarê dikir…

Piştî ku; mêvan ji hewşê derketin, çûn… Dayîka Sîsê û Sîs jî, li dû we hatin cîhê ku, heval xwe lê veşartî.Dayîka Sîsê, bi hemû hêza xwe destê heval guvaşt,xêrhatina heval kir,hal û xatirê haval û hevalan pirsî...

-Saxbê hemû heval bê belanê…

Heval li pêşîyâ,Sîsê li dû heval dayîka Sîsê jî, dû Sîsê derbasî jor bûn.Heval, li ser qursîyê rûnîşt.Li hêla hevalê jor,Dayîka Sîsê zîn, li jêr jî Sîsê rûnîşt.Zinê careka dîn ji heval re:

-Hûn çawanê,bi belanê ?

-Belê. Em, bê belana û em pir jî bi serketî ne.Piştî çalakîya oramara û berxwedana Zapê em pir kêfxweşin…

-Em jî, bi serketina hevalan kefxweş in…

Birayê min Zana,li kû yê,yê dereng vere ?…

Berîya dayîka xwe Sîsê, heval bersivand.Sisê wexta ku; heval pirsek dikir ji, bo ku balê heval bikşîna ser xwe heval hema bersiv dida heval:

-Bavê min, yê çand daqîqê dîn yê bê.Em ê bi hevdûrê biçin dinava gulên xweşik de wêne yên xwe bigirin.Heval tu jî, li gel me were ku; em, bi hevdûrê wêne yê xwe bikêşin …

Heval qet nedixwest ku Sîsê ecz bibe.Sîsê, li ber dilê heval pir giran bû.Sîsê ezîza ber dilê heval bû.Ji bo dê û bavê xwe jî Sîsê ezîza ber dilê wan bû. Sîsê,li ber dilê wan ji pir giran bû…

Di wê kêlîye de; bavê sîsê Zana keta hundirê ode,xêrhatina heval bi hemû hêza xwe bi hembêz kirina heval kir.Hal û xatirê hevalan û heval pirsî:

-Heval çawan e,bê belane?

-Spas, hemû heval bê belan e…

-Tu çawan e,bi ziquman re çawa derbas dike,hin pirsgirêk hene,di navberê te û wan ziquman de ji te razîne,an jî na?...

-Razî bûna çi!ewna bi min re dibêjin ji vir biçe bila, hevalekî dî bê cîhê te…

-Ji bo çi wisa dibêjin…

-Min jî ev sedema fêhm nekir.lê belê, dibêjin ku; tu tu agahî nede me,taybet di der heqê PJAK’ê de…

Lê belê; ez bawer nakim ku, tenê sedem ev yeka be…

-Ez jî bawer nakim ku;sedem bi tenê ev yeka be,Heval…hin agahî hatin guhê min…

-Hin agahîyên çawa kek Zana?...

-Ew; yên ku têne zanîn, ewanê ku li te rûbadane,ewne ku, dibêjin namûs jî têda her tiştekî me ji bo serok APO,ji bo partî dibêjin bi şev û roj karmendên van diçin malên wan,pêkana wan di der heqê te de hin agahîyên nebaş dabin van…

-Raste, kek Zana. Ez, berîya ve çand rojan,çûm mala wan yekî,li we derê min gotibû;ez bawernakim ku, ev karmendên ku bi me re bi nava van dixebitin,karmendên wan agahîyên ku em didina van rast û durist rêdikin paytextê van  an jî na….

-Ez têgîhiştim; ji bo çi, dixwazin tu ji vir biçe,hevalekî dîn were şuna te…

-Bi te aqil sedema serekê ew gotina min ê?...

-Belê heval, ew gotina te gotîyê;ez bawer nakim ku, evanê agahîyên ku, em didina wan rast û durist rêdikin paytextê xwe,an jî na?...Ez bawer dikim ku; ewanê ku, li ser dewla serê partî qasî dinê bûnê xwedan  xwedan mal,milk û sermîya…

-Ango, ewan hîz û diz…Ewanê ku,bilî cuzdan û doxîna xwe tu nirxên mirovatî li gel nemane…

-Belê,heval…

Di dema ku; Heval û Zana bi hevdû re diaxifîn,Sîsê jî, xwe ker û lal kiribû.li ser maxfûr li quncikê odê de rûniştîbû.lê belê; mirûzê xwe pir tirş bû…Çawên bavê Sîsê, wexta ku, bi Sîsê ket ku mirûzê we pir tirşa,Bi sîsê re got:

-Karxazala min; ji bo çi li wî qunçikî xwe kar û lal kirîye?ji bo çi rûyê karxazala min tirş in?Were cem min…

Sîsê; bi awayekî kelagîrî hat cem bavê xwe. Bavê Sîsê; hinarikên herdû alîyên rûyê Sîsê maçî kirin.lê, ji bo ku daxwaza Sîsê ji, alîyê heval û dayîka we nehatibû pejirandin pir bêjar bûbû.Ji ber vê yekê, peyv ji devê sîsê dernediketin…dayîka Sîsê, berê xwe da Sîsê û ew bersivand:

-Keça minê delal, xwe xemilandîye;ji bo ku, em, bi hevdû re biçin di nava gulê xweşik de wêne ye xwe bikşînin,lê dibêja bila heval jî li gel me bê…

-Ez jî, heval jî; em naxwazin karxazala min bêjar bibe,li xwe li me ragira,heval yê şal û şapikê min li xwe bike,em ê şaşikeke,  jî bo ku heval bide serê xwe,berçavkeke ji jî bidin heval em ê bi hevdûrê biçin wêne ye xwe bikşînin û bizivirin…

Zînê; şal û şapik,şaşika Zana û berçavkek anî, dan heval.Heval, di heman deme de xwe hazir kir.Her çar bi hevdû re;heval û Sîsê li qursîya paşîyê,Zîn ji, li qursîya peşîya sîwar bû.Di çûn û hatinê de, kem bi hevdûre axifîn,carekê Zana bi heval re,got:

-Heval, eger ku, di rêde hina ji te pirsî;bêja ez di rêde li vê texsîyê sîwar bûm.

-Baş e kek, Zana…

Carekê  Sîsê ji heval, cîhê ku gerîla têde dimînin ji heval pirsîn:

-Heval, cîhê ku gerîla têde dimînin çawan e?wek vê derê xweşikin,ase ne?...

-Belê, wek bihiştene…

-Ma qey tu çû ye bihişte?...

Wexta ku; Sîsê bi heval re got;tu çû bihişte hat,heval ji pirsa Sîsê matmayî bû,şermizar bû,nikarî bersive bide Sîsê…Heval, jî bo ku Sîsê ji wî, hin pirsên dî ji wî neke,bi dil û can bi sîsê re:

-Li wî bajarî, keçika herî xweşik kî ye?

Wexta ku; ev yeka heval ji sîsê pirsî hem ji kêfxweşî,hem jî ji şermê rûyê sîsê sor bûn.Vê carê jî Sisê heval nebersivand…

Her çar di nava gulên xweşik de wêne ye xwe kişandin.Gulê xweşik û Sîsê ew qas li hevkirin ku ,ew qas bi ser hevdû ve bûn ku …Sîsê ji gulê xweşik xweşiktir bû. Piştî ku, wêne ye xwe kişandin hema zivirîn bajêr. Di rê de, qet bi hevdû re neaxifîn.lê belê, wek diçûyîne de di zivirandine de ji, Her sê;heval dayîk û bavê Sîsê bi tirs û fikarbûn. Tenê, Sîsê ne bi tirs û fikar bû.Tirs û fikara wan û ya heval; di mijara, polês an jî leşker yê nasname heval pirsbikin,an jî pirsnakin de bû. Lê, di rêde kesî ewane nedan sekinandin,bê bela heya bajêr hatin…Heval, nêzî mala komuneyê yekkesî; destên dê û bavê Sîsê guvaştin, hinarikên rûyê Sîsê maçî kir û derîyê texsîyê nîv vekirî li Zana zivirî berê xwe da Zana:

-Kek Zana; berîya ku ez ji texsîyê peya bibim, ez dixwazim ku, di derheqê mijarekê de tu min agahdar bike …

-Kerem bike heval…

-Ev behsa sezdekê tê kirin; li kurdistanê rojhilat û Îran ê? ev çi ye sezdekê? Wate ya xwe çi yê?

Ji bo çi xelkê vir vê rojê derdikevê çole?

-Heval, sezdek an jî sezdeh heyva nîsanê,wateya xwe ev e;xelkê me, bawer dike ku, roja sezdeh nîsanê rihekî xêrnexwaz, rihekî xirap dikeve malan… Gelê me jî; ji bo ku, ew rihê xêrnexwaz û xirap ji bo ku nekeva malan,ve rojê li çolan bimîne derdikevin çole.

-Spas, ji bo agahîyên te kek Zana.

-Em, li sezdeke; ango, siberoj biçin gelîyê Qessemlû heval

-Bila, kek Zana

*************************

Siberoj; heval, berîya ku tav derkeve; berîya ku,tava rojê bide pencera ku heval li dinive, heval ji xew rabû. Nivînê xwe rast kirin. taşteka sivik xurînîya xwe şkenand. Ji bo ku; di texsîyede bîzê wî venebe, ji mala komunê derket, berê xwe da cîhê ku Zana û Zinê li banda wî ne.

Heval gîhişt wê derê ku; Zana û Zînê di texsîye de li benda wî ne. Di texsîye de; bilî Zana û Zînê kûrê wa nê biçûk Nebaz û Sîsê jî hebû.Heval bi rojbaşe li texsîye sîwar bû.

-Hûn çawa ne? Hûn bê bela ne?

Berîya hemûyan Sîsê, heval bersivand:

-Sax be heval. Em, hemû bê belane, tu çawa ye?

Piştî bersıvandina heval a Sîsê; Zîne û Zana bêrê xwe dana Sîsê û kenîyan…Sîsê ji; bo ku berîya dê bav û birayê xwe heval bersivand şerm kir.spîtîyâ rûyê Sîsê winda bû.rûyê Sîsê sipsor bûn. Lê, ji bo ku Sisê hêna xiçil nabe; dayîka Sîse gota heval; keça min wekîla me ye,dikane bi navê me hemûyan bersive bide heval….

Ji bo ku,xelkê bajêr berê xwe sezdeh nîsanê dabûn çolê; wesaît di derketina bajêrde wek morîyan diçûn û dihatin.Mirov ji wesaîtan ax biaveta hewayê li erde nediket…

Ji derketina bajêr, heya gelîyê Qessemlû; Zana her mihemed Arif Cizrawî dabû ser teybe, hemûyan bi kêfxweşî Mihamed Arî Cizrawî guhdarî dikir.Careke, an jî dû caran Zîne gota Zana;edî mihemed Arîf Cirawî bes e,em Eyşê Şan gûhdarî bikin hîna ne çetir e?

-Ji bo ku Mihamed Arîf Cizrawî mêr e; tu dixwazi îllam em dengê jinakê guhdarî bikin,na wisa ye?...

-Na, bi serê Sîsê,ez jî dengê Mihemed Arîf Cizrawî pir hezdikim.lê belê,te ji derketîna bajêr heya vê derê, her Mihamed Arîf Cizrawî da ser vê care jî, bila Eyşe Şan be.

-Min, fêmkir. Ji bo çi tu, Eyşe şan dixwaze?

-Ji bo çi ez dixwazim ku tu Eyşê şan bide ser,em jî vê yekê bizanin.

-Ji bo ku, ew jine tu cînsîyetparêzîye dike.

-Tu ji min cinsîyetparêztir e.Eger ku; ne wisa bûya, ji bo çi kengê virde, em Mihemed Arîf guhdarî dikin?

Nêzî, nîv Saete Zana qeseta mihamed Arîf Cizrawî neguherand.Piştî, nîv Saete qeseta Mihemed Arif Cizrawî ji teybê derxist a Ayşe şan xist Şuna we.

Wexta ku; Zana, qeseta Eyşe Şan xist şûna qeseta Mihemed Arîf Cizrawî Zîne, devbiken gota Zana: ez, dizanim, tu ji min zêdetir ji dengê Eyşe Şan hezdike .lê, ya ku di dilê tê de tu vedişere…

-Ji bo çi, ez ji dengê Eyşe Şan hezdikim?Ji bo ku, ew jina ji ber wê yekê

-Belê, ez wisa difikirim,

-Ango,ez ji dengê tê jî pir hezdikim? Tu dibêja ku;tu ji dengê jinan pir hezdike.Wê wextê, tu ji dengê min jî hezdike,sî sale dengê te ez gêj kirim.

-Bila, Ya te be Zana Efendî.gotinê te nebidilin,tişte ku devê te dibêje dilê te nebêja, got û Zîne axaftina xwe kut kir.ji bo ku Zîne, axaftina xwe kut kir Zana jî axaftina xwe kut

Demekê kes bi kesîre neaxifîya.lê, ev bêdengîya bi bi axaftina Zîneye bi kurê xwe bi nebaz re bi dawî bû;

-Nabaze min ji bo çi tu bê dengê, ji bo çi qet tu naaxifi?

Ez, we guhdarî dikim.Nexwazim bi taybet axaftinê te û bavê min ez gelek jê kêfxweş dibim,gelek jî jê sûd werdigirim,li paşarojê ev nîqaşên we yên bi min re bibin alîkar.

Kûrê min; tu, tevlî nirxandinê min dibe, an jî tevlî nirxandinê bavê xwe dibe?Tu ji dengê keçan hezdikê an ji, ji dengê xortan?

Nebaz ji şerma dilê xwe bersiv neda dayîka xwe.

Wexta ku; axaftina Zinê bi kurê xwe Kawa yê Nebaz re bi dawî bû;Heval berê da Zîne, wate yê navê kurê we pirsî;

-Xwîşka min ;ez wate yê Kawa dizanim.Heta wek hemû kurdên serwext,ez dizanim ku paşnava Kawa ji bo ku Kawa Hesinkar ê, ji bo çi dibêjin Kawayê Hesinkar, ez wateya vê paşnavê dizanim.lê belê, çima hûn bi kûrê xwe re dibêjin kawa yê nebaz,ez wateyê paşnavê nabaz nizanim?Hûn dikarin wateyê paşnavê Nabaz b imin re vebêjin?

-Ji bo ku, Kawa yê Hesinkar; tu çaran xwe ji şer nedidaye paş,ji ber ve yekê kurd bi Kawa re dibêjin kawa yê Nebaz.

Heval, di dilê xwe de ev gotina Nabaz çand deqîqan hizîrî.Di dilê xwe de heval ev mijara bi xwe bi xwe re nîqaş kir;hemû Zanayên şer,yên ku emrê xwe di şer de derbaskirine dibêjin ku,şer hileye,lê belê kurd jî pesnê yên ku di şer de xwe nadin paş didin,

-Kek Zana, ji bo çi bi Kawa yê Hesinkar re gotine Kawa yê Nabaz?

-Ez bawer dikim ku;wexta ku, Medan bi gelên dîtirê bindest,bi hevdûre, bi împaratorîya Asûr re  Şer dikirin ,yên wek Asûrîyan yên ku serdest û dagirker şer bi hîleyan di dina meşandin.Ji ber ku, jîyanê wan li ser hîle,xepandinê bû.Jîyana medîyan jî,  li ser li rastî û dûrîstîyê bû,di jîyana wande; xepandin û hîle tunebû.jîyaneka wisa bandora xwe li ser şewazê şerê wan jî kiribû…

-Baş e, kek Zana…Lê belê; piştî ku, medan împraratorîya Asûrîyan hilweşand û li dijî dagirkerîya Asurîyan bi serketin, careka dîn mirov di dîroke de serketineka kurdan nabîne,ev di şerde serneketina kurdan mirov çawa binirxîne?

-Heval, ez bawerdikim ku; ji medîyan heya roja me ye îro kurd bi  pîranî dûra dewletê sekînîne,lewme dura hile ,xepandin ,derewan sekinîne.

-Ango,tu dibêja; hîlê,derew ,xepandin şewazên dewletê û yên çînên serdest in.

-Belê heval.

Piştî axaftina di navberê heval û Zana de;yên ku di texsîyê de, heya pêşîya qesra Qessûm'lû de kes qet bi hevdû re neaxifîn.

Zana; li pEşîya Qesra Qessûmlû texsî da sekinandin. Hemû ji texsîyê peya bûn.Zana gota heval:

-Em, derbasî nava qesre bibin,tu jî qesre bibîna.Zinê, li dijî vê yekê helwest nîşanda,gota mêrê xwe:

-Ma, te eqlê xwe xwarîye!Heval, li gel me li nava qesrê bigere!Yekî şeytan jî şeytanîyê bike, wêne yê me û heval bikêşe,mala me û mala heval  ê wêran bibe…

-Ji bo çi, mala me û ya heval  ê wêran bibe?

-Yên ku,li vir wêne yan bikêşin,misoger yan şaytanê dewletê îran'ê ne na, yan jî jî bo berjewandîya xwe yê şexsî yê me jî heval jî bifiroşina dewletê.Heta, ez dibêjim; bila heval disa li texsîyê sîwar be,bila kes wî nebîne.

Di vê hêyne de, Sîsa ku qet nediaxifî,gota bavê xwe:

-Raste,bavo. Ez jî dibêjim ku, bila heval dîsa li Texsîyê Sîwar bibe…

-Baş e keça min; bila ya te û dayîka te be..

Li ser gotinê Zana yên dawî, heval li texsîyê sîwar bû.Heya kû; Zana ewna jî qesra şehîd Qessûmlû derketin bala heval  li ser qesre û  hûr û kûrbûna heval li ser tevgera Qessemlu bû.Heval, xwe bi xwe re her li ser Sîyaseta Îran'ê  Tevgera Qessemlû dihizirî…Dilê xwe de digot;Sîyaseta îran'ê di derheqê kurdan de ez bawer dikim ev e,kurd bê serî hiştinê,çawa ku …Bi kuştina Qessumlû di heman demede kurdên rojhilat bê serî hiştine…qesra  Qessemlû jî bi wî rengî bê xwedî hiştine…Heval, dinava van hizir û fikaran de bû ku; Zana, ewna, ji qesrê derketin ber bi texsîye hatin, li texsîyê sîwar bûn.Lê belê, her çar jî; wek çûbûn maleka ku lê şîn hebe,li wan hatibû…Mirov digot ku; her çar çûne sersaxîyê mirîyekî,li ser wî şîn kirine…

Zin;li kêleka zana,li qursîya pêşîyê rûnîşt.Berê xwe da heval;gotineka bav û kalên me he ye,dibêjin ku; serî nebe dest û pîyan tû qîymeta xwe nîn e.Wexta ku; ez ketim,Qesra qessûmlû ev gotin heta bîra min.Bi şehît kirina Qesemlû kurdên rojhilatê Kurdistan'ê bê serî hiştin Îra'nê…Qesr jî, bê xwedî hişt in û kes jî li qesrê nanêre.Heya, demeke qesr ye wîsa bimîne; li dawî yê ji bi xwe hilweşe…Sîyaseta Îren'ê ji bo kurdan wisa yê;kurdan bê serî bihêle di demeke de bila birizin  tune bibin…

Ji qesra Qessemlû, heya cîhê ku di gelîyê Qesemlû de heya êvarî  bîmînin, Zana texsî ajot.lê belê; ji bo ku ji xelkê gelek mirov hatibûn seyranê ,rêka deh an jî banzdeh deqîqan nezî saeteka ajot,gelîyê Qesemlû ji bo sezdekê bi mirovan tija bû.Xelkê,  bi kincên xweyê reng bi reng derketibûn,seyranê. Xelkê derketibû seyranê Gelî ya Qesemlûyê rengdar  hîna rengdar kiribû .Gelîyê Qessemû di sezdekê de wek cîhê dawetê bû.Xelkê ku li gelîyê hina li ber dahol û zirnayê dilan digerandin. Hina jî, pez serjêdikir,hina ji xwarin çêdikirin.Zana, li cîhekî ku, lê, heya êvarî runîn,cîhekî ku ba lê nagire, cîhekî ku bi talde,bo ku bibîne ji cem malbeta xwe û heval çû,piştî çand deqîqan zivîrî,hat. Zîn'ê jê pirsî:

-Ma qey,te cîhekî bi talde dît,eger te cîhekî bi talde nedîtibe îro em ê gelek zor û zahmetîyê bikêşin…

-Malbata Rahîm jî, hatinê seyranê.Cîh wan xweştire,em ê biçin cem wan.

-Rahîm ewê ku dû caran zewîcîy ê, ne wisa ye?

-Belê. Ewe ku, navê jina wîyê mezin Rahîmê,navê jina wî yê biçûk jî, Medîne?

-Wê wextê, em biçin.

Hemû rabûn, ber bi cîhê ku malbata Rahîm lê meşîyan ,gîhiştin wê derê ;Rahîm, li pêşîya malbata xwe ewanê jî hemû li dû wî  xêrhatina heval bi hembêz kirina heval  kir.  Malbata wî jî, yekû yek guvaştina destê heval û  destê malbata  Zana û Zîne xêrhatina wan kir.Zînê, çû; cîhê ku jin lê disekinin,heval,Zana û kûrê Zana, Kawayê Nabaz jî çûn cîhê ku zilam lê disekinin. Li cem wan

runiştin.Sîsê jî, li wan deran şivikekeka ji darê bîyê destê we de digerîya.Nişke ve dengê Zilamekî bilind û bi hêrs hat;zilam destê jina wî di destê wî de li Sîsê re qîr kir :

-wisa neke! Ma dê û bavê te li ku dere ne? Tu berdane çole, kî di pêşîya te re dibori tu ev şivika ji darê bîyê tu li wan dide!li ser ev gotinê bi hêrs Zana Li cîhê ku rûdinişt rabû; çû, ji zilam lêborîna xwe xwest,gota Zilam û jina wî:

-Ew keça mina,li me biborîna…Zarok in .Hîna ne serwext in.Hina tiştên baş û nebaş ê ji hev dernaexe,

-Xem nake,keka got û zîlam Sîsê hembêz kir rûyê wê ramûsandin.Paşê jî wî hinarikên rûyê Sîsê ramûsandin,bi jina xwere got:Inşallah, keçeka me ye wisa yê bedew Xwede bide me

-înşallah…

Zana, bi zilam re got:

-Ez bawerdikim ku, we nû şû kirîye?Xwede we bextewar bike.Xwede zaroken ji Sîsê xweşiktir bide we…

-Bila, Zarokên wek Sîsê bide me, em ji, Xwede tiştekî dî nexwazin.Ji ber ku Sîsê ji gulên xweşik jî xweşiktir e…

-Sax be, xwede mirazê we hasil bike…

-Keka, em biçin çem me. Çayeka me vexwe.

-Keka spas, em ê li nav van baxçeyan bigerin,xatirê we…

-Oxira xêre be,got û Zana bi destê Sîse girt hat cîhe ku; heval,rahîm û zilam lê rûdînin.

Rûnîştin.Sîsê jî, li ber çokê bavê xwe rûnîş. Zana, keça xwe Sîsê ber bi hembêzê xwe kişand, bi hemû hêza xwe gûvaşt ,Sîsê hem ji şerma xwe, hem jî ji guvaştina bavê ve sipsor bû,spîtîya rûyê we winda bû. Ji ber ku; rengê Sîsê sorspî bû. Navê Sîsê yê ku; Zana û Zînê li keça xwe kiribûn wateyê wî navî,bi kurdî bi keçan an jî jinên sorspîre dibêjin, Sîsê,Bi xortan an jî jî mêran re jî dibêjin; Sîso…

Zana, bi keça xwe Sîsê re Got:

-Keça min; eyba, şerma! Ji bo ç,i tu diçe paş ve, li jin û mê re xelkê dide.Baş bû ku; ew jin û mêr mirovê serwext bûn. Xwe li te bêjar nekirin.Baş bû ku; dinavberê me û wan de tu nexweşîyan rûneda.Eger, zarokekî wek te wisa bike; dinavberê min û ew zilam û jina ku te ledayîbû gengaz bû ku pevçûn derbikata…

Sîsê; wexta ku axaftinên bavê xwe guhdarî dikirin hîna sortir dibû.Sisê ji, hembeza bavê xwe hedîka rabû.bavê we jê pirsî :

-Ku da keça min?...

-Ez ê biçim, cem dayîka xwe.

-Baş e keça minê delal, biça lê belaya xwe di kesî neda.

-Baş e bavo.

Sîsê, ji bo ku, ba kincên ve raneke hewaye ,ji bo ku rahnê we, ji ber vê yekê, xuyanî neke bi kincên xwe girt û çû.Li peşîya cîhê ku rûnîştîbûn; jin ,bûk û keçên Rahîm xwarin çêdikirin.Zinê jî, destpêke alîkarîya wan dikir:paşe jî, dev alîkarîyê berda, hate cem zilaman rûnîşt.ji her halê Zîne dîyarbû ku; ji Rahîm ecz bûyîbû.Zana, hedîka jê pirsîyar kir,gotê; ji bo çi te bi wan re alîkarî nekir?

-Rahîm; dû jin ,sê bûk û sê keçê wîye li ber şûkirine hene,dîsa jî, ew xwe di ber karê jinan re dike,ji ber we yeke, ez ecz bûm. Min dest ji alîkarî kirina wan berda.Zana hedîka gotê:

-Te,ya baş kirîyê

Jin ,bûk û keçên Rahîm; li pêşîya cihê ku rûnîştîbûn xwarin çêdikirin.Xwarina ku; dixwestin çêbikin jî, goştê kelandî û pirinç bû. Hem tevlîbûna karê wan Rahîm; hem jî bayê we roje yî dijwar jin,bûk û keçên Rahîm jî bêzar dibûn.

Xwarina malbata Rahîm;ango frawîna we rojê, piştî nîvro li saet sê hazir bû.Lê, di serî de jin ,bûk,keçê Rahîm; yê ku li wê derê,ango yên kû li ser wê sifreyê hazir, kes ji xwarina wan nerazîbû,xwarineka şor û bê tam,goştekî nekelîyayî bû xwarina wan… Herkesekî li ser sifreyê; xwarina ku Zîne, li mal hazirkirîbû anîbû Xwarin .Hina ji ji bo ku Malbata Rahîm dilê xwe li wan negire çand parî ji xwarina wan xwar in.

Ser danê êvarê ji, hevdû xatir xwestin,Ber bi bajêr bi rêketin.Ji bo ku,di rêde wesaît pir bûn,bê bela dereng gîhîştin bajêr… li cîhê ku, heval ji texsîye peya bibe Zana ji heval pirsî:

-Heval em te li ku deynin,te li ku peya bibe?

-Kek Zana; ev cîhê nêzî mala me ye komunê,ew cîhê te zanîn

Zana,bi texsîye gîhişt cîhê ku heval jêre gotibû ;Ez ê, li we derê peya bibim.Zana, texsî da sekinandin.heval yekû yek destê hemûyan guvaştin ,hinarikên rûyê Sisê ji maçkirin,destê xwe dirêjî derîyê texsîyê kir;Zine dev biken,gota heval:

-Siberoj,were cem me. Ez Du jin çi tinîn serê mirov, ,di ve mijare de ez nerîne xwe bi te re vebêjim…

-Baş ê .Siberoj,eger ku; tu karê min dernekeve ,ez mêvane we me… careka dîn xatirê we,êvar baş…

-Êvar baş…

Bi gotina êvar baş a Zana're di heman demede heval derîyê texsîyê vekir,li jêr û jora rêka asfalt nêrî û ji texsîyê peya bû.

****************************

Qet li paş xwe, ango; li Zana wan nanêrî. Ber bi mala komune yê yek kesî meşîya.Gîhişt mala komunê.Derbasî hundirê xanî bû.ji bo ku li seyranê û çûn û hatina seyranede gelek westîyayî bû,hema çû serşoyê xwe şuşt û hema xwe li ser nivînan dirêj kir.Heya destê sîbê têr nivist.Wexta ku; tavê li pencera odeya ku,tê de nivistî hişyar bû.Heya ku,malê derkeva, biçe mala Zana û Zîne her li ser rewşa Rahîm hizirî.Rewşa Rahîm'ê ku di dest dû Zinan de,rewşa rahîm ê ku;di dest dû jinan de ku pirperîşan bûyî,heval her hizîrî…Jixwe heval nezewîcîbû:heval jî, bi piranî nedizewicîn.Hevalên ku, berîya ku, tevlî refê şoreşe bibin ku zewicibin jî,heya ku, şoreş pêkwere xwe didan karê şoreşe…Heval hemû, wek di gotina pêşîyan de hatîbe gotin; Bi şoreşê azadî û wekhevîye re zewicî,ango bi jîyanê azad û wekhev re

zewicî,bi mirîne re bidergîstîbûn.Heval ji, mala komunê heya mala Zana û Zinê jî; li ser rewşa ku pir jin anîne hizîrî,hûr û kûr bû.Heta ew qas li ser ve  mijarê hûr û kûr bûyîbû ku,wexta ku;biçe mala Zana li texsîyeka yekî Azerî sîwarbûyîbû.Şofêrê texsîye, li halê heval nêrîbû ku gelek dihizirî,bi heval re bi zimanî Azerî gotibû:sanirim hesablarî katiksan(ez bawerdikim ku te hesap tevlîhev kirine)

Heval jî bi zimanê tirkî şofêr bersivandibû;yok kerdeş öyle bir şey ben sadece şehrîn güzelliklerine baktiğim için öylesine dalmişim.

-sen îstanbûl Türkçesi konuşuyorsan,sen Türkiyelisen

-Doğrudur kardaş .

-Hoş gelmişsen, başim la gözüm üstüne gelmişsen…

-Saxol kardaş .

Heval gîhişt ber derîyê mala Zana.Dêrî nîv vekîrîbû.Heval bisteh  derbasî jor bû. Tenê Sîsê li mal bû.Heval, herdû hinarikên rûyê Sîsê maçkirin.Berîya heval ji Sîsê bipirsê, bêja; dê û bavê te li ku ne? Sîsê,gota haval :

-Dê û bavê min çûn nava bajêr. nişka ve mirovekî me nexweş ketîye.Dê û bavê min,ji ber ve çande çûn nexweşxane.jixwe, tu dizani xwişk û birayê min ji, çûn dibistanên xwe.

Sîsê,heya ku dê û bavê we ji nexweşxane bizivirin,li kêleka, heval rûnîşt û dest bi pirsan kir…Hin pirsên wisa ji heval dikirin ku,heval matmayî dibû.pirsa Sîse yê yekemîn di der heqê xwezaya Kurdistan ê de bû:

-Heval cîhê ku gerîlla, ango heval lê dimînin, cîhê çawane?Ase ne?Dar û bar ê xwe ha ne?Ava xwe zor e?Ava xwe  tazî ye?ango pir sar e ?

-Belê, ew tiştên ku dibêja; hemû li  kurdistan ê hen e.Kurdistan wek şanesekirina te ye,bi kurtasî Kurdistan wek bihişteye…

-Heval mat e bihişt dîtî ye?

Wexta ku,Sisê ji heval pirsî,ji heval re got ;ma qey te bihişt dîtîye?Heval nikarî bersiva Sîse bide.Heval pir bi ber xwe ket.Heval matmayî bû…

Sîse, wexta ku;rewşa heval dît ku, heval nikarê  bersive bide,bi heval re got:

-Ez dizanim, xweza ya ku gerîlla têde dimîne,wek xweza gundê meye,wek xwezaya gundê me bi xêr û ber,bi dar û bar,bi ava ,pir çem,rûbar,kanî têde hene.Pirsên  Sîse li dû hevdû dihatin;pirsa herî balkêş jî ji pirsên Sîsê di derheqê Şehît Berîtan de bû:

-Heval, me doşev fîlmê Şehît Berîtan temaşa kir.Heval şehît Berîtan, ji bo çi xwe ji ew zinarê bilind,zinarê ku mirov nikarê li xware binêre de xwe diavêje?

-Wexta ku;şehît Berîtan ew zinrên ku, dibêja ew zinarên ku  gelek ase û biliind xwe diaveje,di navberê me û ew partîyên başûrê kurdistan'ê  PDK û YNK bi dewletê Tirkan dagirker re îttîfaq kiribûn, li dîjî me şer dikirin,Ji bo ku, şehît Berîtan ji  esîr  nekeve dest wan xwe ji zinaran divaje.Ew

berxwedana,şehît Berîtan berxwedaneka dîrokîye,li dîjî paşverûtîyê kurdên ku her bi dijminê kurdan re îttîfaqe dikinê.

-Dê û bavê min jî bi min re vegotibûn;Eger ku, PDK an jî tevgera  Barzanî nebûya,tevgara Qesemlû li Dijî Îran'ê yê bi serketa.Dê û bavê min dibêjin; ji sedema tekçûyûna tevgera Qessemlû, yek jî PDK ango îttîtaqe Barzanîyan bi Îran'ê re ye…

-Heva,l şehît Berîtan kîjan salê û li ku derê şehît ket?

-li Xakurke,li sala 1992…

-Heval, eger ku;  ez mezin bûm ez jî dixwazim wek şehît Berîtan bibim gerîlla.

 Bi dawî bûyîna axaftina Sîsê û lêdana zengê derîyê hewşe di heman deme de pêk hat.Sîsê, bi heval re got :

-Biborîna,dive ez li derî hewşê binêrim, ka kî yê ku li zengê derî dide…

-Xem neke, biçe lê binêre,dibe ku dê û bavê te bin,dibê ku hinê bîyanî bin…Eger  ku, bîyanî ne bila derbasî jor nebin. Wan re bêje;kes li malê nîne ,bika derbasî jor nebin.

-Baş e heval…

**************************

Sîse çû,ji bo ku derî hewşê veke.Heval jî, çû ber pencere;li paş perdeyê li  derîyê  hewşe nêrî. Sîsê ji yên ku li paş derîyê hewşê pirsî,  got hun kîna,kî kesin û derî vekir.Dê, bav û zilamêk jî li cem wan ketin hewşe.her sê yan jî,  Sîsê hembêz kirin. Rûyê we yê sorspî maçî kirin û derbasî jor bûn.Ye kû yek xêrhatina heval kirin. Heval jî xêrhatina wan kir.Heval berê xwe da Zana :

-Bila derbasbûyîbe:Xizmê we yî nexweş çi lê hat,şane( înşelleh) nexweşîyê xwe negiran e?...

-Ev pismamê me ye,tavê li serî da ye.

-Careka dîn derbasbûyîbe.Îsal tava rojê gelek dijwarê, gelek  mirov îsal bi tavê yan nexweş  ketin,yan jî jîyana xwe ji dest dan.mirovên wek te û mîn ê keçel,emrê wan edî mezin, pêwîste xwe paş biparêzin…

-Gotina te ye heval. Pêwîste, em edî xwe ji xwarin,vexwarin,li serma û garmê xwe biparêzin…

-te ve carê erzan derbaskirîyîe;dibe ku, careka dîn bextê te wisa lênede…

-Gotina te ye heval…

 -Te û karxezala min, çi kir heya ku em hatin?...

-Heya ku hûn zivirîn,ez bi pirsan pirpêrîşan kirim.ji her mijarekê ji min pirs pirskirin.Doşev me hemûyan  fîlmê li ser heval  Bêrîtan temeşe kir,her bi min û bavê xwe re digot; eger ku ez mezin bûm, ez ê ,wek şehît berîtan ê bibim gerîlla,ezê wek şehît Berîtan bibim keçeka azad….

- Ez, bawer dikim ku; Sîse tu bi pirsan gêj kirîyê. Heval do te sezdek çawa  dît?Tu ji xizmetê me kêfxweş bû?an jî tu ji xizmetê me bêjar bû?...

-Na. xwişka min Zînê; ez ji, we qet bêzar ez nebûm.Bayê do; yê ku dihat ew bayê dijwar,em hemû bêjar kirin.lê, me kesî nedikarî, em wî bayê dijwar bidin sekinandin.Ew tiştekî xwezayî bû.Lê belê, tiştên ku,ez  zêde jê ecz bûm rewşa mala Rahîm bû.Ez bi xwe tucaran nezewîcim.lê belê, mirov wextê ku,yên wek Rahîm dibîne fêm dike ku, yên ku du caran dizewicin,di çi halî de ne…

-Halê wan ne tu halê, heval. Halê wan rezîltîyê. Ji malbata Rahîm yek yekî guhdarî neke.Heya dawî hevdû dihesidînin,heya dawî ji hevdû bawer nakin,

-ji ber vê yekê, ez bawer dikim  ku;her di mala wan de,pevçûn,nerihetî u hesûdî he ye…

-Ji wan jî zêdetir,dibejin kû; kî yê ji wan jîyana xwe zû ji dest bide ku,mîras ji yên dîtir re bimîne…

Li ser ve gotina Zinê, heval matmayî ma û ji zîne pirsî:

-Ango; dixwazin Rahîm û Rahîm ê zu bimire,mîrate bi wan re bimîne,ne wisa ye xwişka min?...

-Belê, heval  heman wisa ye. Berîya vê çand rojan, kurê Medîneyî herî  biçûk bi jinbava xwe  re gotibû:

-înşelleh,tû ye zû bimirî!Ev sindoqa ku,tiştên  giranbiha têde,yên wek zêr,zîv û dolar hemû yê bi me re bimîne…

-Ango,ew qas li hemberî malê dinyayê çavbirçî,ew qas jî bi hevdû re hesûd in…

-Ew qas bi hevdû re hesûdin ku;Ew qas; li hemberî malê dinyayê çavbirçîne ku, jîyana wan li wan dibe jar.Heval ez bi xwe rojekê jî tehemula we jîyanê nakin…

Edî qala jîyana;yên ku bi dû jinan re di zewicin,jîyana wan;di we jîyane de tekîlîyê wan,di van tekîlîyan de hesîdûya wan û li hemberî malê dinyayê çavbirçîbûna wan heval bêzarkir,bîzê heval ji we jîyane vebû.Ji ber vê çandê, heval xwest bi wan re li ser mijareka dîtir biaxive,dîtînê wan bistîne:

-Berîya ve çand roja, ez li mala dostekî mebûn;zilamekî kincên wî ne utî kirî,Kincên wî kurmicini,li kêleka min li ser kursîye runiştîbû.Zilam çavê wî her yek girtî, yek jî vekîrîbû.Zilam, piştî kêlîyekê zirm ji qursîyê kete xwarê.Dîlê min pir bi wî zilamî şewitî…Piştî ku; ew zilamê ku li kêleka min rûnîştî,ew zilamê ku ji kursîye ketîye xwarê, ji me xatirê xwe xwest û çû… Lê belê, ji  her halê wî dîyardibû ku,zilam gelek bi ber xwe ket…

-zilam ji, kîjan miletî bûye heval ,ji dostê we,te pirsîyar kir?...

-Belê, kek Zana min pirsîyar kir;Zilam yekî cihû bûye…

-Cihûyê ku,li Îsraîl'ê;  meşa wan ,axavtina wan,hertiştekî wan, ji  cihûyê ku li Îren'ê cîhê ne.Cihûyê li wî welatî wek parsekan in.Bi şev bi roj ji  jîyana xwe ne  ewle ne.Ne xwarina wan xwarina, Ne jî vexwarina wan vexwarina…Ez, bawer dikim ku; ew ye ku li mala dostê me te dîtî ,yê ku li kêleka te ketîye xware,ji tirsa serê xwe, wê şevê xew nekîrîbe…Ji ber vê candê, her bi  roj xilmaş bûyîbe, li ser kursîyê pix kiribe xewe, lewma ketibe…

Heval; we rojê ,ji sedemên serdana mala Zana û Zîne, ji bo ku xatirê xwe ji wan bixwaze bû.Ji ber ku, peywira heval li wê derê edî bi dawî bûyîbû.Heval berê xwe da yên kû, li derdora wî rûnîştî,her çaran:

-Edî,ez ê ji vir biçim.Peywira min ê vir xilas bû.Ez hatim, xatirê xwe ji  we bixwazim.

-Ji bo çi, te çand rojan berê bi me re negot ku; tû yê biçe?me pêdivîyên ku, li çîya bo te pêwîst, ji bo te peyda bikirina…

-Spas kek Zana.Min hemû pêdivîyên xwe hazir kirin;kinçên gerîlla,şûtik,parke,h.w .d….

-Plav jî te ji bo xwe peyda kir?...

-Belê.

-We wexte, tiştekî ku em bêjin nîn ê.

-Çefîya te he ye?

-Na, min cefîye peyda nekir.Lê belê; ew her dû bajarê ku liser rêka min in ez ê yeke bikirim.

Zana, destê xwe avete cefîya ku li ser milê xwe:

-Gerîla bê cefîyê nabin.Cefîye hin caran bo gerîlla,lehîf,hin caran doşek,hin caran jî pêşkîr a.

Sîsê cefîya ji dest bavê xwe girt, anî da dest heval.

Heval rahişt cefîye ya, destê Sîsê, bi destê Sîsê ji girt,rabû ser pîyan:

-Edî, ez biçim.

Hîna zû ya,li gel me firawîne bixwe, hinge biça…

-Ez, çi qas zû biçim, ji bo min ew qas xweştir a,pewîste ez hazirtî ye xwe bikim…

-tu dizani…

Heya, ber derîyê hewşe bi heval re hatin.Li ber derîyê hewşê Zana u pismamê wîye ku ji tava rojê nexweş ketîbû, bi hemû heza xwe heval hembêz kirin.Zine jî, bi hemû heza xwe destê heval guvaşt.Heval, xwe bi ser hinarikên Rûyê Sisê re xwar kir, her dû hinarikên rûyên Sîse maçkirin.peyv ji gewrîya Sîse, bi zorê derdiketin.peyv kîte kîte ji gewrîya Sîse derdiketin:

-ox…ir…a xê…re be,ser…ket … tin ….he…val

*************************

Heval ji, piştî nîvro heya berbanga sibê tiştek nexwar ne jî vexwar.Frawîna mala Zana û Zîne; ji bo heval we rojê bû şîv jî…Heval wek carê berê heya sibe nîv hişyar, nîv jî razayî bû.Wextê ku, bi ser karekî biçe heval her wisa bû; heya sibê têr xew nedikir.Xilmaş dibû,kêlîyek di xew de diçû,kêlîyeka dîn hişyar dibû. Heval ji, ew taybetmendîyê xwe bi şik û guman bû. Taybetmendîyaka baş e, an jî taybetmendîyeka xirab e…Tu caran terkaxem nedikir.Berîya ku, zilamê ku wî heya ser sînor bibe gazî wî bike, dû saetan zûtir radibû.Wê şevê jî wisa kir.Dû saetan berîya ku, zilamê ku wî bibe ser sînor teslîmê qecexvan bike,ji bo ku disînore derbas bike,dû saetan zû rabû.Taşteyeka sivik;çand lib zeytûn dû sê dîlîm panêr û bi berdaxek çay taşteya xwe kir .Dibe ku; mirov xwarineka sibe zû bi wî rengî re nebeja taşte,mirov vê re bêja xwurînîya xwe şkenand hîna çêtir be…Heya ku; zilamê karmendê dewlete ve re telefon bike,dinava solone de yekcaran gerîya,yekcaran jî li ser kursîye rûdinîşt.Wexta ku; zengê tlf na zilamê ku wî bibe, lêda,bi zilam re got li benda min be,heya çand deqîqan tê cîhe te

gotî…Rahîşt  dû çante xwe yekê gerîlla, yekê sîvîl çû ser rêka asfalte. Zilamê ku; wî bibe li kêleka rêka asfalte li banda wî bû,bi zimanê azerî,gota wî:

-Siba te bi xêr…

-Siba te jî bi xêr…

-Te, taşte xwarîye?

-Belê  bira…

-Di derketina bajêr de; emê hin sandawîç,hin avafeqî  ji bo xwe bi kirin…

-Baş ê bira…

Di derketina bajêr de zilam, texsî da sekinandin .Xwest ku; ji texsîyê peya bibe.Berîya wî, heval bi lez ji texsîyê peya bû.Çû ji, super merketê dû avfeqî û  sandewîçek û desmalkaxizek kirî. Zivirî, hat li texsîye sîwar bû:

-ji bo çi, te ji bo xwe jî sandewîç nekirî?...

-Di rêde bîzê min vedibe…

 Heval desmal kaxizî danîn pêşîya texsîye û memûrê dewlete texsî  bi lez ajot .Şofêrê texsîyê bi rastî şofêr bû.Texsî di rê de qet nedihejîya. Rê ew qas nexweş bû,ew qas kert û  kort lê hebûn kû, dîsa jî ne texsî  de hejîya, ne jî hildipakîya .Bi rastî, sofêr şofêr bû.Ji bajarê ku derketîbûn, heya bajarê ser sînor; sê  bajar,çar bajarok û gelek gund hebûn. Yekcaran di rê de qet her dû jî bi hevdû re nediaxifîn.yekcaran jî ,kem  bi hevdû re di axafîn.Karmendê dewletê, karmendekî hibijare bû.Kem axifî ku, sirê dewletê xwe eşkere nebin,Dibe ku; ji bo ku, yê ku bi wî re rewîtîye dikin, ji bo ku bi sirê wan û planên wan nehesibe wisa tevdigerîya.Heval di ve mijare de ji wî xiraptir bû.Devê herdûyan jî kêre venedikir …Careka tenê karmendê dewletê bi heval re got:

-Em, li ku derê frawîne bixwin?heval ji bi wîre got:

-Ew cîhê ku, em her tim lê xwarine dixwin…

Karmend bi heval re got:

-Ew xwarinxana ku; navê xwe 2000 ne wisa…

-Belê

Heval bilî ve axaftina, bi karmend re her li ser derbaskirina  sînor, her li ser derbaskirina sînor û li ser qecexwanan hizirî.Ev hizirandin careka tenê kut bû.Ew jî li bajarokekî ,karmend gelek bêjar bû.Xwe bi xwe re bi ziman'ê  Azerî got:

-Ya qanûna mirovatîye çîye?..

-Çi bû ?...

-Li wî bajarokî ye rê nedin xelkê bîyanî. Bi taybet jî yê  rê nedin yê wek min.saeteke ez li korne Didim mirovekî tenê jî rê nede min.Wexte ku, mirov ji wan di pirsî,dibêjî ji bo çi tu rê nadî?...

Dibêjin ku; qanûna bajarokê me wîsa ye…Ez jî bi wan re dibêjin ku;qanûna mirovatîyê çawa ye?...

Heval jî di dilê xwe de got;yên ku, gelê me kirînê wî halî hûn in….

Heval di rê de her li ser qecexvanan ,li ser jîyana wan hizirî:qecaxvanî çi ye,xelkê me bi taybet jî yên nezîkî ser sînoran rûdîne,jibo çî jîyana wan bi qecexwanîye derbas dibe?….

Gora heval, Qeçexwanî;qeçexwanî dewlet guhdarî nekiribûn bû.Tevî dewlete jiyankirin bû.qeçexvanî yekcaran meranî,yekcaran jî bêbextî bû….Heval gelek caran bi qecexvanan re sînor derbaskirîbû.Pir bi qecexvanên comêr re jî,bi yên bêbext re jî rêwîtî kiribû.Carekê ji bo ku,ji sînor derbasî rojhilatî Kurdistan ê bibê, bi dû qecexvanan re di rêwîtî kiribû.Qeçexvanan li heval bêbextî kiribûn.Barê her dû qeçaxvanên ku li heval bêbextî kiribûn wîskî bû.Şeş wesaîtê ji landgrouser wîskî bû.Berfa demsaleyê dêstpêke barîbû.Berfa pûk bû.Qaşo qeçaxvanan bi buldojerê rê paqiş kiribûn.lê, hîna qedereke berf li ser rêka wesîta şoşe mabû.Ji ber wê çandê, wesaît çand metiran diçûn û di berfe de ase diman qeçexvanan bi bêre pêşîya wan wesîtan ji berfê vedikirin. wesaît bi defdanê ji nava berfê derdiexistin.Heya nehê şevê qeçexvan bi zore ji berfe derketin reşayîye…

Li cîhekî ku,bayekî dijwar û cemidî tê sekînîn.Heval di wesaîteke de bêkalorîfer bû.Kincên heval jî tenik bûn.Heval gora hewayê nerm kinc li xwe kiribûn.Ji ber wê yekê, ji sermayê şik şika diranên heval bû.Heval ji sermaye di lerzîya…

Hin qecexwan çûbûn rê kifş bikin.Ew qecexvanan çûbûn rê kifş bikin zivirîbûn. Şofêran wesaît ajotibûn.Li gundekî ku sayên xwe ji sewalên wan zor tir,wesaîta ku heval têde şofêr li pêşîya hewşa malekê de dabû sekinand. Qecexvan, bi heval re gotibû; bi lêz peya bê biça vê malê…Heval ji, wesaîte daketibû xware ,derîyê hewşê malê ji bo ku vekirîbû heval derbasî hewşe bûyîbû,pênç sayan êrîşî heval kiribûn.heval ji dirandina kuçikan xwe bi zore parastibû ,Di wê heynê de, malxwe male derketibû devre:

-Ew kî ye?...

Heval ji tirs û heyacanê gotibû; ez heval im …

- Kerem bike, derbasî jor be…

-Sax be bira…

Malxwe malê bi heval re:

-Heval ji bo ku,tu teslîm bibe hate rojhilat?...

-Na bira,ez berpirsîyarê vê derê me.

-Ma çawa tu berpirsîyarê PKKyê dewletê me ye?Di navberê PKK û dewletê me de şerên dijwar diqewimin,tu jî livir berpirsîyarê?..Ma qey te nagirin?Eger ku,te negirin jî, bi bêbextî dikanin pir tiştên xirap bînin serê te?...

-Îran bi PJAK Ê re di nava pevçûn û şer da ye.Ez ne nûnêrê PJAK ê me. Ez nûnerê PKK me.

-Ma qey, her dû jî ne yek in?...

-Na bira herdû ne yek in,PJAK bi tenê partîya Kurdistana rojhilat ê.

Piştî axaftina di navbera heval û malxwe malê de,kêlîyekê bê dengîyek ketê ode.Di vê kêlîyede heval li ser pirsa malxwe male hûr û kûr bû;gotina ku,malxwe male bi heval re gotibû tu ji PKK revîya,tu di xwaze ku teslîmî dewletê me bibe…heval li ser vê gotina malxwe male di dîlê xwede wê kêlîyê gotibû;ev xelkê me ye rojhilat taybet yên ku li ser sînor niştecîh,bi piranî jî ji van yê dewlemend bi dewlet re dixebitin…

Malxwe malê  piştî vê bêdengîyêbi heval re got:-em ê rabin,tu jî li di odê kurê min de, li gel wî biniva.Jixwe, kurê min yekî totik vale ye.Ji tiştekî fêm nake.Dîsa jî, tu li gel wî behsa sîyasete neke.

Heval bi malxwe male re gotibû;baş e …malxwe malê jî , bi heval  re ,gotûbû; şev baş û ew û her sê jinên xwe ji mezel derketibûn çûyîbûn…Heval jî, xwe dinav nivînan de dirêjkiribû,xwe dirêjkirin û nivistina heval di heman deme de bû;ji ber ku, heval pir westîyayî bû.

Heval nêzîkî sê saetan nivistibû.Bi rêyîna sayan ji xew hişyar bûyîbû.Sa ew qas har direyîn ku,reyîna san dinya dihejand…heval jî bidengê rêyîna sayan  ji xew hişyar bûyîbû.rabûbû ser pîyan dî paş per deya pencerede li hewşa xanî nêrîbû.Di hewşede bîst an jî bîst pênc pasdaran malxwe male destê wî kelepçekirî li gel xwe biribûn…

Di heman deme de jina malxweyê malê ye mezin hatibû oda ku heval tê de nivistibû.Bi heval re,gotibû:

-Heval pasdar hatin malxwe me birin.Bi me re jî got;heval westîyayîye.Ji xew hişyar nekin:lê, ji bo ku ji gurçika xwe amelatkirîye,em ditirsin ku di êşkence de li xwe mikur were…Ji ber vê yekê,  tu ji gund derkeve ji bot e jî, jî bo me jî çêtir e…

-Ez di ku re derkevim derveyî hewşe?..

-Were heval; di ve silimre derkeve ser banê xanî,li paş banê xanî şivarê ye,di wê şîvarê de ji gund bi dîzî derkeve,bila kes bi te nehese,dibe ku hîna pasdar li gund bin…

Heval bi spaskirinê xatirê xwe ji jinikê xwest. Di silime re çû ser ban. Di ser  ban re xwe avêt xware û kete ser şîvarê.lê,sayên gund hemû hatibûn heval.Heval ji bo ku xwe ji kuçikan biparêze, xwe avetibû bin sîwaneka lembayê elektîrîrike pêketî…

Wexta ku; heval ji bo ku xwe ji kuçikan biparê xwe çûbû bin sîwane,di  kunckekî sîwaneyî ku şewqa lembe lênede de mêr û jina male rûnîştî dîtîbûn.Bi dengekî bitirs ji heval re gotibûn tu kî ye?Tu li vê derê li çi digerî? Pasdaran niha zilamekî me girtin birin.Eger ku, tu  yekî  qecexe,bi lêz ji gundê me derkeve,serê me jî, yê xwe jî neke bela ye!

Heval jî bi wan re gotibû;sayan bêdeng bikin, ez ji gund derkevim.Zilam û jina wî sa bêdeng kiribûn û heval ji gund derketibû…

Ji gund  derketibû serê girekî bi ewla.Ji bo ku, hem alîyê ku biçe bibîna,hem jî ji bo ku çoltere kifş bike.Alîyê biçe bêdeng xûyanî dikir.Ji dûr ve jî şewqê lempê gund û bajarokan xuyanî dikir:alîyê biçe gora elektîrîkê pêketî tespît kiribû.Gora elektîrîkê pir pêketî alîyê ku biçe  tespît kiribû…Ji ber ku, elektîrîkê kem pêketî yên gundan  bûn.Heval jî  dixwest biçe bajar an jî bajarokekî

Heval, gora  lembê elektîrîkê pir pêketî çolabir kete ser rê û meşîya…Di hin cîhan de; bi hesenî, di hin cîhan de bi zahmetî derbasbûyîbû…yekcaran, bi nacarî di dolekê tarî û coyên avê de dimeşîya.ev cîhê

ku meşîyayî, jî hemû kelemê dirîyan bûn.Ji stirîyê kelemê dirîyan dest,rû wî û kincên wî çirîyayî bûyîbûn.Di rêde gelek caranket rabû,ket rabû …Ji ber ketin û rabûne dest,ling û pîyê wî reş bûyîbûn…Qedereke rê meşîyayî bû.Cemêkî mezin û şelû derket peşîya wî.Cem bi heybet diherîkî.Ji bo ku cem şelû bû,kûranîya wî nedîyar bû.Demeka kin cem derbasbike an jî neke ketibû nava dudilî yê. Ji neçarî li cem dabû.Ava cem dabû kirika wî.Bi zahmetî cem derbaskiribû.Destê sibê wexta xandina dîkan hatibû guhê wî.Ber bi dengê dîkan meşîyayîbû,Di rê de raste pezê meşin hatibû.Lê, şivan bi nehesîyayî bû,Heval jî nexwestibû şivan bi wî bihese…Bi wî rengî ketibû nava gund.gundekî li serê girekî ber bi bajarok dirêjkirî …

Di hewşeyekî de mirovan dîwarê xanîyekî dihunandin.Dû mrovan jî çay vedixwarin.Heval bi silavdayîne ketibû wî hewşeyî.Ji zilamekê çayê vedixwun re gotibû;Ji vir heya Şino texsîyê diçin, li ku di sekini?...Her du zilama bi heval re ,qet negotibûn kerem bike bira; çayeka me vexwe,Tenê bi destê xwe cîhê ku texsî ji bo rewîyên bajêr wergirin nişanî wî dayîbûn û bi heval re gotibûn ma tu tucar e?...

Heval ji helwesta wan gundîyên ku ;negotibûn, kerem bike bira çayeka me vexwe,matmayî bûyîbû.Ji ber ku, di adetên kurdan yek li wan bibe mêvan,an jî dekeve hewşe xanîyê wan, kurdê wî dawetê rûnîştin an jî xwarin û vexwarine bikin…

Heval ji, cem wan zilaman heya cîhê ku wesaîtên diçin Şino çûyîbû.Kêlîya ku, gêhiştibû vê derê texsîyek ji di heman deme de hatibû vê derê…Heval bi şofêrê texsîyê re gotibû;heya Şino tu yê min bi çand tumenan bibe?...zilam gotibû; hezar tumen.Heval ji bi şofêr re gotibû;we wextê,min xususî bibe Şino?..şofêr jî gotibû baş e…

Di rê de; heval bi şofêr re gotibû; min hê na taşte nexwarîyê, em li Şino taşte bixwun, hînge bi rêkevin?...

Şofêr bi heval re gotibû;tu bîyanî ye, ez vê yekê halî dibim.lê, liv tevgerê te wek Apoyîyan ê û sofêr di diaxaftina xwe mayîna xweye li sala 1992 ne li xakurke û navê hevalên ku nasdike bi heval re gotibûn…

Heval jî serpêhatîya xwe bi şofêr re gotibû.Şofêr matmayî bûyîbû!...Tenê, bi heval re gotibû; wellehî hûn hemû Apo yî zîrek in,bê tirs û xof in.Ez, bûma min ji sînor heya vira ji tirs û xofa ajalên dinye û mirovan gavek jî nediavet…

Şofêr bi heval re gotibû;min gelek heval xwedan kirine, em biçin mala me taşte bixwun.Piştre, ez ê te bibim Ûrmîye…Heval ji, ev gotina şofêr qebûl kiribû…Şofêr di rê de zivirîbû mala xwe…

Jin û zarokên şofêr yan xerîpdost bûn; yan jî ji bo ku heval dinasîn, heval wek yekî jî malbata xwe pêşwazî kiribûn.Du kur û keçikeka şofêr hebûn. A herî biçûk keçik bû. Heya ku; heval ji malawan rabû di hembêza heval de rûnişt. Heval, bi wî rengî deşteya xwe xwaribû.Wexta ku; xatirê xwestibû keçike nexwestibû ku ji mala wan biçe pêsîra heval berneda bû.,Dayîk û birayê we jî, bi heval re gotibûn;ji bo xatirê keça mê , îro li gel me bimîna…Heval ji bi wan re gotibû;ev yeka negengaze,ji ber ku, karên min ê bi lez û girîng hene û careka dîn xatirê xwe ji wan xwestibû û ber bi Ûrmîyê bi reketibûn.Di rê de, qet şofêr û heval qet neaxifîbûn.Careka tenê şofêr bi heval re,gotibû,;em di kîjan rêke de biçin? heval jî gotibû;eger ku, kîjan rê ewle ye, em di wê rê ke re biçin baştir a…Di rêka bi ewla bi hesanî gihîştibûn Ûrmîyê…Heval kiribû, nekiribû şofêr ji heval dirav wernegirtibûn.Di texsîye de hatibû rûyên hevdû û xatirê xwe ji hevdû xwestibûn….

Ji ûrmîyê, heya cîhê ku karmendê dewletê heval teslîmê qecexvan kir;ev serpêhatîya heval wek kareyê fîlmekî di pêş çavên heval re derdas bûyîbû.Lê belê, ev serpêhatîya wek kareya fîlmekî sê caran kutbûyîbû. Careke wexta firawîn xwarin…Carekê ji, karmendê dewletê heval heye di zimanê farsî de wateya he,an jî tuneye pirsî,wî jî gotibû;hest e,ango heye, nîst jî,wateyê we tune ye… Heval jî bi henek gotibû: ez spasîya te dikim. Ez ew qas li weletê we mam, wexta ku; ez jê diçim ez hîna he ye bûm…Careke jî, dostekî karmendê dewletê; karmend, ji cîhekî heya cîhekî dî li texsîye sîwar kir ,dostê wî ji karamendê dewlete pirsî:

-tu ye ku de biçe?...

-Ez ê wî hevalî disînor re derbas bikim.Piştî vê axaftinê jî,ji bo ku heval ji wan fêmneke bi farsî; bi hevdûre axifîn,lê heval ji axaftina wan hevokek fêm kir,ew jî ji axaftina wan ev hevok bû;karmendê dewletê bi dostê xwe re serpêhatîyeka xwe ye derbaskirina sînor re got; Min careke, bo pêywireke sînor derbasdikir.Ji leşkerên me ye sînor navê şevê(parola) ji min pirskir;min ji bi wî re got;xwede yî…leşker jî biMin re got:

-xwe de nîst,gule da ber çeka xwe…

Bi wî awahî, gîhiştin cîhê ku; qecexvan heval di sînor re derbas bike.Qecexvan li wê derê, li benda wan bû.piştî silavê karmendê dewletê ji qecexvan ,bi farsî pirsî:

-Kemîn hestî?(kemîn he ye)

-Kemîn nîst(kemîn tune ye)…

Heval û karmendê dewlêtê ji hevdû xatir xwestin…Qecexvan di pêşîyede,heval jî di dû wî de, berê xwe dan sînor…Rêka wan saetekê hewraz, piştre serberjêr bû:Qecececxvan di hewrazde wek pêzkûvîyan bi hewa ket.Heval jî, her bîst an jî bîstpênc gavan li paş wî bi hewa ket…Qecexvan, piştî ku heval bi hewa ket demeka kin li gel heval ma.Heval di mejde, mijarekeke hişê wî mijûl dike, ji qecexvan pirsî:-Keke, ji bo çî mirov ku serê çîyan dikeve, bê tirs û bê xof a?Wextê ku; mirov di çîyande ye gelek ji xwe bawer dike…Bi xwe bi xwere dibêje ku; çi qas zilmkarê dinyayê dagirker,metinger hebe mirov dikare li hemberî wan şer bike…

-Wek gotina te ye keke…Li wateyê; vê yekê ez jî nizanim…Bersiv dayîna qecexvan û rabûn ji heval xatir xwestina qecexvan di heman demede bû .Herduyan jî, xwe serberjêr berda xware…Heval çû refê gerîllayê azadîye .Qecexvan jî, çû derdora gundê xwe ji bo ku yekcaran jin,zarok û xizmê xwe bibîne…

Nivîsandina vê romanê yê destpêke; di mehên mijdar,kanûna sala 2009 û di mehên çilê,tirmeh û tebaxe yên sala 2010 de ye….

Nivîskar

Husên Engîzek(Cafer)